Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1372 | 29-Nîsan-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Bi wênexêzên xwe kolanên bajêr dike pêşengeh





**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

**Ji ber heskirina wênesaz Mîlad Ebdî ya zêde ji wênesaziyê re, dîwarên kolanan ji xwe re kiriye mîna pêşengehê. Wênesaz Ebedî diyar kir ku ew ji bo bedewkirina kolanên bajêr dixebite û got, "Wênesazî ji min re cîhaneke taybet e."**

Hunermendek ku li benda temaşevanên pêşangehê nema, bi hezkirin pêwîstiyên xwe yê wênexêzê amade dike û dîwarên kolanê bajêr yên bêdeng, bi deng dike.
Di demekê de ku gelek hunermend bi salan ji bo pêşangehan xwe amade dikin, li bendê ne ku gel were û karên wan bibîne, hunermendekî ciwan hilbijart ku ew bi xwe biçe gel temaşevanan. Hunera xwe bir ba mirovan li şûna ku li benda wan be.
Civak bi çand û hunera xwe tê naskirin, ewra huner beşa herî girîng di civakî de ye û xwedî roleke girîng e. Herwiha di jiyana mirovan de jî xwedî cihekî taybet e. Çimkî huner eynika çanda civaka xwe ye, çi muzîk çi govend çi stran û çi jî wênexêz. Her hunermendek bi riya kar û xebata xwe hem çanda gelê xwe diparêze hem jî li pêş dixe. Ji ber vê yeke divê pêşxistina karê hunerê di civakê de neyê paşguhkirin, ji ber ku huner mîna çekan di rewşên şer de ye.

### Wênexêzî ji wî re cîhaneke taybet e

Mîlad Fewaz Ebedî yê 34 salî ji bajarê Amûdê yek ji hunermendê wênexêziyê ye, ew bi pênûsa hunera xwe û rengên wê can dide dîwarên sar. Mîlad di derbarê karê xwe yê van sala gelek tabloyên ku êş û hêviyên gelê xwe nîşan didin, afirand. Li kêleka tabloyên xwe, ew wekî boyaxkarê xanî jî dixebite. Ev yek karê wî yê wênexêziyê li pêş dixe. Wênexêzî ne tenê xêz û reng in, dema ku ji hezkirinekê ava dibe, ji bo hunermend dibe perçeyek ji giyanî wî. Hunermendê wênexêziyê Mîlad Fewaz Ebedî ji rojnameya me re wiha behsa kar û hezkirina wî ya ji wênexêziyê re kir.
Di tabloyên wî de hezkirina wî ya ji wênexêrê re diyar dibe, ji ber ku ew di her wênexêzeke xwe de nameyekê dide. "Wênexêzî ji bo min ne tenê pênûs û rengin, ew ji bo min cîhaneke taybet e. Wênesaz ne tenê kesek e ku firçeyekê digire, wênesaz ew e yê ku tabloyên bêdeng vediguherîne qîrîneke bi hest û bi bandor. Herwiha dive her wêneyek wî/wê xwedî nameyek taybet be. Çimkî dema ku mirov li tabloyên wênexêzan dinrên, ya despêkê dixwazin nameya wê wêneyê nas bikin."

### Hezkirina wî ji wênesaziyê ji zaroktiyê û heta niha didome

Mîlad ji zaroktiya xwe de ji wênexêziyê hez dike û wiha dibêje: "Ji dema ez zarok bûm min ji wênesaziyê pir hez dikir û heta roja me ya îro ew heskirin di dilê min de maye. Ez jê vê heskirinê di rêya wênesaziyên xwe dîwarên bajarê xe bedew dikim. Min ev yek hilbijart da ku ez rasterast nameya ku ez dixwazim, bigihînim gelê xwe."
Derbarê curayên boyaxê yê ku Mîlad bi kar tîne, boyaxên avî û neftîne, ku buhayên wan di navbera sê û heta 15 dolaran e. Ew tekez dike ku karê wî hewceyê mîqdarên mezin ên rengan e, ji ber ku ew ne li ser tabloyên bi çûk xêz dike, ew li ser dîwaran wênesaziyê dike.

### `Wênexêza fermandar Mezlûm destpêkê di dilê min de hatiye xêzkirin`

Di nav berhemên wî yên girîng de tabloya wêneyê fermandarê Giştî yê Hêza Sûriya Demokratî QSD'ê Mezlûm Ebdî ye, ku wî bi çavên girtî wêne xêzkir. Di vê ceribandinê de Mîlad Ebedî dixwest peyamek bide: "Ji hezkirina min ya zêde ji fermandar Mezlûm Ebdî re min destpêkê wêneyê wî di dil û bîra xwe xêz kiriye. Herwiha nameya min jê vê tecrûbeyê ew e ku, tekez bikim ku di hunerê de tiştekê zehmet tuneye. Afirînerî dikare ji sînorên kevneşopî derbas bibe."

### `Ez dixwazim fermandar bibînim`

Mîlad di wê baweroyê de ye ku, wênesazî zimanekî bêdeng e, di rêya wê de mirov dikare gelek çîrokan bîne ziman, ev yek jî hêzek taybet dide hunerê da ku bandorê li mirov bike û wî teşwîq bike ku kûr tir bihizire. Mîlad wiha şîrove kir: "Ji ber vê yekê, bi rêya berhemên xwe, ez hewl didim ku nêrîna mirovan ya li ser rastiyê biguherim û pirsên wan ên li ser tiştên ku wan dorpêç dikin, teşwîq bikim. Herwiha daxwaziya min ew e ku ez rojekê fermandar Mazlûm Ebdî bibînim, ta ku ez taployekê diyarî wî bikim."
Tevî hezkirina wî ya pir ji wênexêziyê re, Mîlad rastî gelek pirsgirêkan re rû bi rû dimîne, pirsgirêka herî zêde şilbûna dîwaran e ku bi demê re dibe sedema perçebûna boyaxê û zirarê dide tabloyên wî. Gelek caran Mîlad hewl daye ku madeya vê pirsgirêkê çareser dike, bikire, lê ji ber buhabûna wê, nikare bikire. Tevî vê yekê jî ew karê xwe berdewam dike.

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER HÊZÊ Û DERFETAN**

**Av di cirnan de nayê kutan:**
- Kesên xwe di ber karên giran re dikin, lê ne li gorî wî karî bin, ji bo wan tê gotin.

**Benîştê dînan ji ritlê ye:**
- Karê ku nikaribe bike dide pêşiya xwe.

**Bila reşê we xuya bike:**
- Qelebalixê zêde bikin; bila hêza we, qelebalixa we xuya bike.

**Hêka xurt di destê min de ye:**
- Hêz li cem min e; ti kes li hemberî min nîne; ez serketî me.

**Ji hirçekî du eyar dernakevin:**
- Her tişt hêzeke wê pîvaneke wê heye; her kes nikare pir tiştan bike:

**Ji xezalê bezatir nîne ew jî rizqê xwe dixwe:**
- Çiqas mirov jêhatî jî be nikare her tiştî bike.

**Li gorî didanên min e:**
- Li gorî hêza min e; ez dikarim wî karî bikim.

**Min deravê wî qam kiriye:**
- Ez wî pir baş nas dikim; ez dizanim ka hêza wî çiqas e.

**Mirov teyrê bêper e:**
- Dema mirov bilez xwe digihîne cihekî pir dûr hingê tê gotin.

**Neynokên mirov tinebin mirov nikare girrê xwe bixwerîne:**
- Ku mirov dest nehilîne belengaz be wê her tim neheqî li mirov bê kirin.

**Nikariya yekî, digot; dido werin min:**
- Nikare tişta sivik bike, dibêje ezê ya giran bikim.

**Reşê xwe bixin navê:**
- Qelebalixê zêde bikin; bila hêza we, qelebalixa we xuya bike.

**Sing ji ber mêhkut diçe:**
- Karê zehmet bi hêzê çareser dibe.

**Sing naçe, mêhkut dibe:**
- Bi heman wateyê.


**Talanê moriyê liba cê ye:**
- Hêza wî ewqas e, ji wê pê ve nikare; derfetên wî nînin.

**Textê min gelek mixan hilnade:**
- Ez nikarim barê xwe girantir bikim; hêza min evqas heye.

**Tîra min tê de naçe:**
- Ez pê nikarim.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

📷 Bi kamîreya Ferhad Resûl





## Di herikîna dîrokê de rastiya pêşengtiya jinên Kurd (2)

Destkeftiyên ku bi bedelên giran ji xeta Bêrîtanan heyanî qadên Rojavayê Kurdistanê û cîhanê hatine bidestxistin; Rastiya pêşengtiya jinên Kurd di dîrokê de ye.**R-2**

## Di cîhanê de mezinkirina zarokan li ser fikrên tundûtûjiyê



Di serdema modernîteyê de çima diyardeyên mezinkirin û neçareserkirina tundûtûjiyê li gel zarokan derdikevin holê, gelo dixwazin bi vê yekê civakê bi nifşên nû ji hev bixin.?**R-7**

## 1'ê Gulanê roja çirûska têkoşîna karkeran li seranserî cîhanê

Her sal 1'ê Gulanê weke 'Roja Karkeran a Cîhanî' tê pîrozkirin. Cara pêşîn di 1'ê Gulana 1890'î di kongreya duyemîn a Enternasyonalîstên Sosyal de ev roj hate ragihandin. Mebest ji vê rojê ew e ku dawî li kedxwariyê were anîn û mafê karkeran misoger bibe.**R-4**





Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1372 | 29-Nîsan-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# 'STRATEJIYA DEWLETÊ XAPÎNOK E PÊWÎST E PARTIYÊN TIRKIYÊ BI ERKA XWE RABIN'

Parlementera DEM Partî ya Sêrtê Sabahat Saritaş da zanîn ku Rêber Apo heta niha ji para xwe zêdetir kiriye, lê ramana stratejîk a dewletê taktîkek xapînok bi kar tîne ku hindik dide, lê pir qezenc dike. Ji bo pêşvebirina pêvajoyê jî, ne tenê Dem Partî pêwîst e hemû partiyên siyasî li Tirkiyê bi erka xwe rabin, ji ber ku ev pêvajo di çarçoveya xwe ya civakî û dîrokî de ji her cure siyasetê mezintir e.**R-6**





## Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Helbestvan Ayjan Gorî sembola jina Kurd a ku peyv kir rêya azadiyê. Helbestvan Ayjan bi bedewiya tîpên xwe û bi rewanbêjiya wateyên xwe tê cudakirin, lewra peyvên wê bi nermî û dilpakî diherikin dilan, birînan derman dikin, rehetî û aramiyê didin giyan.**R-9**

## Ji destpêka salê ve Rûsya 1700 km² ji xaka Ukraynayê kontrol kiriye

Hêzên Rûsyayê di şerê li dijî Ukraynayê de stratejiya "êrîşên biçûk yên li pey hev û domdar" bi kar tîne, di encamê de ji destpêka salê ve artêşa Rûsyayê zêdetirî hezar û 700 $km^2$ û 80 deverên niştecihbûnê ji axa Ukraynayê kontrol kiriye.**R-3**



## Kirîza aborî û xizmetguzarî li Dêrazorê kûrtir dibe

Piştî kontrolkirina bajarê Dêrazorê ji hêla hikumeta demkî ya Sûriyê ve, astengî û aloziyên aborî her ku diçe zêde dibin. Di heman demê de ji ber kêmbûna derfetên kar, asta bêkarî û xizaniyê bilind dibe û xizmetguzariyên bingehîn jî bi giştî tên hilweşandin.**R-8**



**Tifaqa Neteweyî**
Farûk Sakik R-4



**Partiyên siyasî yekîtiya civakê binpê dikin!**
Dilyar Cizîrî R-6



**Edaleta ku bibe jehra civakan qirkirin bi xwe ye**
Ehmed Hesen R-7



**1'ê Gulanê: Ji Rojava heta Sûriyê berxwedana bi ked û azadî**
Gulîsta Xalid R-10

# Di herikîna dîrokê de rastiya pêşengtiya jinên Kurd (2)

**Destkeftiyên ku bi bedelên giran ji xeta Bêrîtanan heyanî qadên Rojavayê Kurdistanê û cîhanê hatine bidestxistin; Rastiya pêşengtiya jinên Kurd di dîrokê de ye.**

Zana Roj



### Yekîtîya Jinên Kurd

Di serhildana Qazî Mihemed ya Komara Mihabadê de, di wê demê de yek ji rêxistinên herî girîng ên civakî ku hatine damezirandin “Yekîtîya Jinên Kurd” e. Hevsera Qazî Mihemed Mîne Xanim, Seroka Yekîtiya Jinên Kurd bû. Ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan; hînkirina xwendin û nivîsandinê, tevlîbûna jîyana sîyasî û civakî, perwerdeyîya zarokan û hwd. Rêxistina jinan hate damezirandin di çarçoveya benda 21’an destûrtnameya PDK’ê de ku dibêje; “Jin jî wek mêran di hemû warên sîyasî, civakî û şaristanî de xwedî maf in.” Mîne Xanima hevjîna Qazî Mihemed dibêje: “Qazî Mihemed dixwest hemû jin beşdarî çalakiyên civakî û sîyasî bibin. Jinên Kurd jî bi serfkirina ked û berhemên keda xwe û bi bexşkirina zêrên xwe piştgirîyê didan komarê.” Di dema hikumeta Komara Kurdistanê de, adetên wekî sitandina qelenê, mehrkirina keçên zarok û berdêla jinan hatine qedexekirin.

Ji bo jinan dibistanên rojane û şevane hatin vekirin. Di van dibistanan de xwendin û nivîsandin fêrê jinan û keçan dikirin. Di her herêmê de bi jinan re kombûn çêdibûn, di van kombûnan de pirsgirêkên jinan dihatin guhdarkirin û paşê ji teşkîlatên partiyê re dihatin pêşkêşkirin ji bo çareseriyê.

Li vê derê bîrxistinek ji hevdîtina Mîne Xanim û Qazî Mihemed, helwest û nêrîna wî ya li ser vê babetê hîn bi zelalî dîyar dike: “Ez rojekî digel Mam Ebdulla li ber Hemamê li benda hatina Qazî bûm ku cilên paqiş bidime wî. Dema hatinê, çawa ku min ew dît, ez giryam. Ew zivirî ji min re got: Tu ji ber çi digirî… Divê jinên Kurdan negirîn. Ez baş dizanim ku wê min darve bikin, divê tu jî vana bizanî… ji ber vê yekê girîna te, ne li gorî xweragirtina jina Kurd e.”

“Qazî Mihemed pir qîmet dida xwendin û perwerdeyiyê. Piştî îlankirina komarê di demekî kurt de bo perwerdeyiya bi zimanê Kurdî bi serkêşiya Qazî Mihemed kampanya (helmet) hatin destpêkirin, pirtûk û kovarên Kurdî hatin çapkirin, sînemayek hate damezirandin ku bi qezenca wê zarokên feqîr didan xwendinê.”

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan; hînkirina xwendin û nivîsandinê û wd. Rêxistina jinan hate damezirandin di çarçoveya benda 21’an destûrtnameya PDKê de ku dibêje; “Jin jî wek mêran di hemû warên sîyasî, civakî û şaristanî de xwedî maf in.”Mîne Xanima hevjîna Qazî Mihemed dibêje: “Wê demê ez seroka Yekitiya Jinên Kurd bûm.” “Qazî Mihemed dixwest hemû jin beşdarî faaliyetên civakî û siyasî bibin. Jinên kurd jî bi serfkirina ked û berhemên keda xwe û bi bexşkirina zêrên xwe piştgirîyê didan komarê.”

Damezirandina Komara Kurdistan li Mehabadê, berhemê bîr û îradeya neterweyî ya gelê kurd bû û di dîroka hevdem a neteweyê kurd de dewleta yekemîn bû.

### Ji Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û Tevgera Azadiyê

Di destgirtina pêşengtiya jinên Kurd yên di Rojavayê Kurdistanê de, em ê nikaribin bêyî destgirtina rastiya Tevgera Azadiyê, binirxînin. Ev her du bi hev du ve girêdayî ne û di pêşxistina jinên Kurd li çar aliyên cîhanê û Kurdistanê di 50’î salên dawiyê de xwedî bandoreke pir mezine.

Bi damezrandina Partiyên Karkerkerên Kurdistan PKK’ê re, vejîneke nû di sedsala 21’emîn de ji bo ronîkirina rol, hebûn û hêza jinan li tevahî cîhanê, hate destpêkirin. Tevgera Azadiyê bi îdeolojî û hişmendiya xwe ya ku Rêber Abdullah Ocalan daye destpêkirin re, him di doza gelê Kurd û Kurdistanê de û him jî di doza azadiya jinê de gavên nûjen, bi îdeolojiyeke nû ku weke wê di dîrokê de nehatiye dobarekirin, pêş ket.

Jinan di qadên siyasî, bîrdozî û leşkerî de ji salên 1978’an de cihê xwe girtin û xwe perwerde kirin. Bi şehadeta Şehîd Bêrîtan re di 1992’an de piştî wê bi salekê di 1993’an yekemîn Artêşa Jinên Kurd hate avakirin û heyanî vê rojê jî xwe mezin kir, xwe pêş xist û didome. Bi vê yekê re jinên Kurd bi îdeolojiya Rêber Apo ne tenê di qadên leşkerî de xwe birêxistin kirin, ji wê zêdetir di stratejiya şer li hember guhertina zihniyeta desthilatdar, zayenperest û kevneşop ya civaka xwe birêxistin kir û perwerde kir. Her wiha tevger û rêxistinên jinan li Çiyayên Azad hatin avakirin ku li ser wan bingehan hebûna jinan bi îrade û biryardariya xwe di hemû aliyan de hate birêxistinkirin. Di 50’î salên Têkoşîna Tevgera Azadiyê de bi hezaran jinên pêşeng yên Kurd derketin pêş û bûn mînak, her wiha di nava vê tevgerê de ne tenê jinên Kurd deriyê wê ji hemû jinên cîhanê re vekirî bû û cih tê de girtin. Îdeolojiya Tevegra Azadiyê, azadaiya tevahî civakên bindest û bi taybet ji bo bidestxistin û misogerkirina mafê hemû jinana di cîhanê de ye. Ji lewra di dîroka têkoşîna wê de gelek jin hatine şehîd xistin û di roja îro de bi milyonan jin piştgiriya vê îdeolojî û felsefeyê dikin ku yekemîn modela azadî, demokrasî û wekheviya zayendî di cîhanê de ye.

Bi Şoreşa Rojavayê Kurdistanê 2011’an de felsefeya Rêber APO, xebatên rêxistin û tevgerên jinên çiyayî xwe berda nava qada civakî û yekmîn qada ku tê de rêxistinbûna jinan tê birêvebirin; qada Rojavayê Kurdistanê bû. Jinan bi avakirina rêxidtin û komînên xwe di pêla herikîna şoreşê re herikîn. Ji komînên herî biçûk yên taxekê dest pê kirin û ber bi cihgirtina di astên herî jor û sîstema hevserikatiyê de bi avakirina Rêveberiya Xweser re, xwe bicihkirin. Di qadên Leşkerî de YPJ’ê di 4’ê Nîsana 2013’an de weke mîrateya xeta Artêşbûna Jin, hate avakirin. Di qadên Siyasî, Dîplomasî, rêxistinî û civakî de, di dîroka jinên Kurdistan, serhildan û şoreşên Kurdistanê de; Jinên Rojavayê Kurdistanê şopa yekemîn li dîrokê xistin.

Ji bo xebatên birêxistinkirina jinan û civakê jinên Kurd ên li Ewropayê li ser mîrateya YJWK’ê rêxistinên bi navê Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê (TAJK 1994), Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdisanê (YAJK-1995). Tevgera Jinên Kurd a Ewropayê (TJK-E - 2014) hatin avakirin.

Li Bakurê Kurdistanê jinên Kurd ên hertim pêşengên serhildanan bûn, rêxistinên Tevgera Demokratîk a Jinên Azad (DÖKH – 2003), Kongra Jinên Azad (KJA - 2015), Tevgera Jinên Azad (TJA - 2016) ava kirin.

Li Rojavayê Kurdistanê jinên ku ji destpêka Rêber Abdullah Ocalan derbasî Sûriyeyê bûyî xebatên cepewî didan meşandin, Yekîtiya Star (2005) ava kirin, paşê rêxistinbûna xwe berfireh kirin û 2016’an “Kongra Star” ava kirin. Her wiha jinên Ereb ên li Reqa, Tepqa, Dêrazor û Minbicê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Kombûna Jinên Zenûbiya (2021) ava kirin.

Li Rojhilatê Kurdistanê di encama xebatên bi salan de, Yekîtiya Jinên Rojhilatê Kurdistanê (YJRK-2004) hat avakirin. Komeleya Jinên Azadîxwaz ên Rojhilatê Kurdistanê (KJAR - 2014) hat avakirin, di bin sîwana KJAR de. Ev yek di pêşengtiya jinên Kurd bo hemû jinên azadîxwaz li çar aliyên cîhanê hate kirin. Ji lewra ger em van dîrokan ji bîr bikin, wê demê çawa ku di dîrokê de hewla tunekirina rola pêşengtiya jinên Kurd hatiye kiriye, wê ji hev ne qut be.

Em ê ji bîr nekin ku di 15 salên Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de, zihniyeta sed salan hate têkibirin, hişmendî û polîtîkayên hêzên hegemon li ser jin hatin valaderxistin, rastiya jinan ji jinên cîhanê re hate eşkerekirin, hêz û îradeya jinan ya ku dikare di her alî de bibe xwedî biryardarê derket pêş, jin ji xefkên pergal û malbatê hatin ronîkirin, her wiha di sedsala 21’emîn de hevgirtina jinan li ser xwedîderketin li mafê xwe derxist pêş. Destkeftiyên ku bi bedelên giran ji xeta Bêrîtanan heyanî qadên Rojavayê Kurdistanê û cîhanê hatine bidestxistin; Rastiya pêşengtiya jinên Kurd di dîrokê de ye.

### Dengvedana di cîhanê de

Çawa ku jinên Kurd di dîrokê de li hember emparatorî, mîr û begên xwînvexwar sekinîn, pêngava ku li hember terora yekemîn a ku xeteriya xwe li ser hemû cîhanê hebû DAIŞ’ê careke din sekinîn. Hêza Yekîneyên Parastina Jin YPJ’ê di bû kabûs ji cîhadîstên DAIŞ’ê re. Di dîroka têkoşîna li rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê de Jinên Kurd, Êzidî, Ereb, Suryan, Xiristiyan û yên Enternasiyonal bi destên şervanên YPJ’ê ji DAIŞ’ê hatin rizagarkirin. Ev yek di serdema heyî de bû dengvedana hêza jinên jinan di pêşengtiya YPJ’ê de li hemû cîhanê û di navneteweyî de. YPJ’ê bi îdeolojî û hêza xwe dengvedan û piştgiriyeke mezin di cîhanê de bi dest xist.

Her wiha serhildana Jin, Jiyan, Azadî ya ku dengvedana xwe bi kuştina keşa Kurd Jîna Emînî di sala 2022’an li Îranê hatiye destpêkirin re, bû deriyê serîrakirina jinan li hember sîstemên feudal, nijadperest û zayendperest. Jin, Jiyan, Azadî ya ku Rêber Abdullah Ocalan ji bo jinan gotiye, ev silogan bû siloganeke navneteweyî ya ku nîşaneya azadî û mafê jinan e.

Di dawiyê de em dixwazin viya bêjin, dibe ku ev di îfadekirina rastiya pêşengtiya jinên Kurd di cîhanê de ne têrker be. Bi sedan jinên weke Eyşe Şan, Fatma Reş (Kara Fatma), Zarîfe Xanim, Mestûra Erdelan, Hepsê Xanî Neqîb, Adîle Xanim, Leyla Qasim, Sakîne Cansiz… hene. Lê belê di dîroka herikbar de her çiqasî geşedan hebin jî lê divê em ji dîrokê xwe qut negrin dest. Bi tayebt di nava pergaleke ku her xwestiya van rastiyan di kesayeta gelê Kurd de înkar bike û di nav wê de hebûna rola jin a dîrokî tune bike.



# Li cîhanê 9 dewletên nukleerî

**DYA, Rûsya, Çîn, Fransa, Brîtanya, Hindistan, Pakistan, Îsraîl û Koreya Bakur 9 welatên di cîhanê de ku xwediyên çekên nukleerî ne. Hejmara giştî ya serikên nukleerî yên li çar aliyê cîhanê di destpêka sala 2026'an de gihaşt 12 hezar û 187 serikî.**

Navenda Nûçeyan



9 welat hene ku wekî xwediyê çekên nulkeerî têne nasîn an jî bi gelemperî tê bawerkirin ku xwediyê wan in, ev welat li gorî Peymana Nebelavbûna Çekên Nuklleerî di du kategoriyan de têne dabeş kirin:

### 5 dewletên nukleerî yên “fermî”

Ev ew welat in ku Peymana Nebelavbûna Çekên Nukleerî (NPT) îmze kirine û xwediyê cebilxaneyên herî mezin ên cîhanê ne:

Rûsya: Bi qasî 5,459 serikên nukleerî li cem hene û ew xwediyê mezintirîn cebilxaneya nukleerî ya cîhanê ye.

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê: Di rêza duyemîn de ye û nêzî 5,277 serikên nukleerî li cem hene.

Çîn: Cebilxaneya wê bi domdarî mezin dibe, di sala 2026’an de gihîştiye nêzîkî 600 serikên nukleerî.

Fransa: Nêzîkî 290 serikên nukleerî li cem hene.

Birîtaniya: Xwediyê nêzîkî 225 serikên nukleerî ye.

### - Dewletên çekên nukleerî yên ku îmzekerê peymanê nînin:

Ev ew welatên ku şiyanên xwe yên nukleerî li derveyî çarçoveya peymana navneteweyî pêşxistine:

Pakistan: Nêzîkî 170 serikên nukleerî hene.

Hindistan: Nêzîkî 180 serikên nukleerî hene.

Îsraîl: Ew siyaseteke “nezelaliya nukleerî” dişopîne û hebûna çekê ne piştrast dike û ne jî înkar dike, lê texmîn nîşan didin ku nêzîkî 90 serikên nukleerî di destê wê de ne.

Koreya Bakur: Cebilxaneya wê ya çekên nukleerî her ku diçe zêde dibe û tê texmînkirin ku nêzîkî 50 serikên nukleerî li cem hene.

### Têbînî

Rûsya û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi hev re ji sedî nêzîkî 86 serkên nukleerî yên cîhanê di destê xwe de digirin. Hejmara giştî ya serikên nukleerî yên li çar aliyê cîhanê di destpêka sala 2026”an de bi qasî 12 hezar û 187 serik bûn.

### Dîroka çekên nuklerî li cîhanê

Dîroka çekên nukleerî bi dîtina zanyarî ya fizîkê di destpêka sedsala 20’an de dest pê kir û di dema Şerê Cîhanî yê Duyem de veguherî hêzeke leşkerî.

### Li vir qonaxên sereke yên vê dîrokê hene:

Projeya Manhattan (1942–1945): Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ji bo pêşxistina bombeya atomê projeyeke nehênî da destpêkirin. Ev proje di bin serokatiya Robert Oppenheimer de hat meşandin.

Yekemîn ceribandin: Di 16’ê Tîrmeha 1945’an de, li çola New Mexico yekemîn bombeya nukleerî ya cîhanê bi serkeftî hat ceribandin.

Bikaranîna li dijî Japonyayê (Tebax 1945): DYA di şer de cara yekem û dawî çekên nukleerî bi kar anîn:

6’ê Tebaxê: Bombeya bi navê “Little Boy” li ser bajarê Hîroşîmayê hat avêtin.

9’ê Tebaxê: Bombeya bi navê “Fat Man” li ser bajarê Nagazakî hat avêtin.

### Şerê sar û pêşbirka çekan

Piştî şer, Sovyetê (1949), Brîtanya (1952), Fransa (1960) û Çînê (1964) bûn xwedî çekên nukleerî. Di vê demê de cîhan ket bin metirsiya şerekî nukleerî yê herdemî.

Peymanên kontrolkirinê: Ji bo sînordarkirina belavbûna van çekan, di sala 1968’an de peymana Belavnebûna Çekên Nukleerî (NPT) hat îmzekirin.

### Rewşa îro

Niha 9 welat (DYA, Rûsya, Çîn, Fransa, Brîtanya, Hindistan, Pakistan, Îsraîl û Koreya Bakur) xwedî çekên nukleerî ne. lê herî zêde ku xwedî ev çek in Rûsya û DYA ne. Heta roja îro, metirsiya şerekî nukleerî wekî mezintirîn tehdîda li ser jiyana mirovahiyê tê dîtin.

### Kî hizra avakirina bombeya atomî derxist?

Fîzîknasê Amerîkî J. Robert Oppenheimer wekî “bavê bombeya atomî” tê hesibandin, ji ber ku wî di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de rêberiya laboratuwara Los Alamos di nav Projeya Manhattan de kir, da ku çekên atomî yên yekem pêş bixe. Tevî serokatiya zanistî ya Oppenheimer, General Leslie Groves çavdêriya projeyê bi tevahî kir.

### Agahiyên sereke derbarê avakerê bombeya atomî de wiha ne:

Rola sereke: Oppenheimer çavdêriya sêwirandin û hilberîna zanistî ya bombeyên ku di sala 1945’an de li ser Hîroşîma û Nagasakiyê hatin avêtin, kir.

Projeya Manhattan: Bombe di bin çarçoveyek pir veşartî de ku ji hêla artêşa Amerîkî ve tê rêvebirin, hate pêşve xistin, da ku serdestiya li ser Almanyaya Nazî misoger bike.

Piştî avakirin: Oppenheimer paşê poşmaniya xwe ya kûr anî ziman û hevokek ji pirtûkên pîroz ên Hindûsiye îqtibas kir û wiha tê de got: “Niha ez bûm mirin, wêrankerê cîhanê.”

### Cudahiyên di navbera bombeya atomî û nuklleerî de wiha ne:

Cudahiya bingehîn di navbera bombeya atomî û bombeya nukleerî (hîdrojen/termonukleerî) de di mekanîzmaya hilberîna enerjiyê de ye; bombeyên atomî xwe dispêrin fîsyonê (parçekirina atomên giran ên mîna uranyûmê). Lê bombeyên termonukleerî xwe dispêrin fîsyonê (tevlîhevkirina atomên sivik ên mîna hîdrojenê). Bombeyên termonukleerî bi awayekî berbiçav bihêztir in û enerjiya wêranker a pir mezintir ji bombeyên atomî hilberînin.

### Çekên atomî çi tîne serê mirovan û bandora wê çiqasî mezin e?

Çekên nukleerî di sê qonaxên kujer de dibin sedema wêrankirina tavilê û tevahî ya mirovan: Pêlek germê ya şewitî ku laşan dihelîne û dibe sedema şewitandina mirovan ji kîlometrên dûr ve. Pêlek teqînek mezin ku avahiyan hildiweşîne û di cih de dikuje. Tîrêjiya nukleerî ya tavilê û berdewam ku dibe sedema jehrîbûna tîrêjê ya akût (Îşaî), penceşêrê û kêmasiyên zayînê di nifşên pêşerojê de ku dibe sedema tunekirina tevahiya bajaran û mirina bi sed hezaran.

### Bandorên rasterast (gava teqînê)

Germahiya zêde (şewqa germî): Dibe sedema şewitandina çerm a pileya sêyemîn an çaremîn, tiştên pir nêzîkî navenda teqînê wêran dike û agir li çargoşeyeke berfireh pê dixe.

Pêla teqînê (fişara bilind): Fişareke hewayê ya pir mezin diafirîne ku avahiyan dişkîne û mirovan diavêje xwarê, dibe sedema birîndariyên kur ên tavil û mirinên girseyî.

Tîrêjiya seretayî: Dozeke tîrêjê ya kujer a tavilê ye ku dikeve nav laşan û şaneyan hildiweşîne, di nav çend rojan an saetan de dibe sedema mirinê.

### Bandorên demdirêj (piştî teqînê):

Jehrbûna tîrêjê ya tuj (Had): Kesên sax mane, ji ber hilweşîna mêjiyê hestî, dilxelandin, vereşîn, porhilweşandin û xwînrijandina hundirîn dikişînin ku dibe sedema mirinê.

Nexweşiyên kronîk: Zêdebûneke mezin di rêjeyên penceşêrê (wek losemî) û weremên pîs di nav kesên sax mane de, çêdike.

Bandorên mîratî: kêmasiyên zayînê û pirsgirêkên tenduristiyê ji bo nifşên pêşerojê wekî encamek zirara DNA’yê.

Qirêjiya jîngehê (toza atomî): Qirêjiya av û xwarinê bi radyasyonê, dibe sedema jehrîbûna demdirêj.

### Ji bo parastina ji bûyera teqîna atomî divê çi were kirin?

Stargeha tavilê: Ber bi jêrzemînê an jî navenda avahiyek betonî ve biçin û ji pencereyan dûr bisekinin.

Jiholêrakirina gemarê: Cilên derve yên ku gemar bû, tavilê derxînin û laş û porê xwe bi sabûn û avê bişon.

Li hundir bimînin: Herî kêm divê mirov 24 saetan dernekevin derve.

Xwarin û av: Ji bo dûrketina ji tîrêjê, tenê xwarinên girtî bixwin.

### Metirsiyên çekên nukleerî di roja me ya îro de

Metirsiyên çekên nukleerî di roja me ya îro de ji ber geşedanên jeopolîtîk gihîştine asteke krîtîk. Li gorî zanyariyên dawî, xetereyên sereke ev in:

Pêşbirka çekên nû: Cîhan ber bi qonaxeke nû ya pêşbirka çekên nukleer ve diçe. Dewletên mîna Rûsya û Amerîka li ser nûkirina sîstemên xwe yên mûşekî û nukleerî dixebitin.

Şerê li Ukraynayê: Aloziyên di navbera NATO û Rûsyayê de li ser axa Ukraynayê, îhtîmala derketina şerekî cîhanê yê berfireh û bikaranîna çekên nukleer zêde kiriye.

Aloziyên Rojhilata Navîn: Şer û nakokiyên di navbera Îsraîl û Îranê de metirsiyên ewlehiyê yên herêmî û navdewletî zêdetir dikin.

Têkçûna peymanan: Binpêkirin an jî vekişîna ji peymanên qedexekirina ceribandinên nukleerî (wek Peymana CTBT), rê li ber zêdebûna xetereyan vedike.

Bandorên gerdûnî: Ji bilî wêrankariya leşkerî, çekên nukleerî xetereyên mezin li ser jîngehê, tebeqeya ozonê û germahiya global çêdikin.

### Encama dawî û rewşa niha ya metirsiyên çekên nukleerî di nîvê pêşîn ê sala 2026’an de bi vî rengî ye:

Hilweşîna pergala kontrolê: Peymana dawî ya ku sînor datanî ser çekên nukleerî yên Amerîka û Rûsyayê (New START), di 5’ê Sibata 2026’an de bi fermî bi dawî bû. Ji bo cara yekem di nava 50 salan de, tu peymaneke navdewletî ya girêder nîne ku pêşbirka çekên nukleerî ya van her du hêzên mezin kontrol bike.

Pêşbirka sê-aliyî: Êdî ne tenê Amerîka û Rûsya, lê Çîn jî bi lez çekên xwe zêde dike. Tê texmînkirin ku heya sala 2030’î hejmara serikên nukleerî yên Çînê ji 1,000’î derbas bibe.

Xetereyên li Rojhilata Navîn û Îranê: Aloziyên leşkerî û şerê li herêmê bûne sedem ku peymanên li ser bernameya nukleerî ya Îranê têk biçin. Metirsiyek mezin heye ku Îran ji Peymana NPT (qedexekirina belavbûna çekan) derkeve an jî ber bi çêkirina bombeyê ve biçe.

Li vir metirsiya ji çekên nukleerî û atomî tê xuyakirin ku ew çiqasî zirarê dighînin cîhanê, her çiqasî peymanên ku rê li ber bikaranîna van çekan bigirin hatine çêkirin jî, lê hemû dewletên desthilatdar ji bo pêşxistina van çekan dixebitin, da ku li dijî hev bikar bînin û ev yek wêraniyeke mezin a cîhanê dide nîşandan.

# Siyaseta Trump li hemberî ragihandinê azadiya rojnamevaniyê dixe nav gumanan

Serokê Dewletên Yekbûyî Amêrkayê Donald Trump gelek caran bi gotinên tund êrişî rojnamevanan dike. Ev êriş wekî taybetmendiyên Trump û siyaseta wî li hemberî ragihandinê ne, armanceke kûr li dûv wê heye, ew jî hedefgirtina azadiya çapemeniya Amerîkî ye û meşandina ragihandinê li gorî siyaset û berjewendiyên xwe ye.

**Hemza Sêvo**

Êrîşên dubare yên Trump li ser çapemeniyê nîqaşên li ser azadiya medyayê li Amerîkayê ji nû ve gur dikin. Êrîşên Donald Trump li ser çapemeniyê di qada sîyasî ya Amerîkayê de êdî ne kiryarên awarte ne, lê veguheriye şêwazekî dubare ku hema hema di her rûbirûbûna medyayê de derdikeve holê. Bûyera herî dawî di dema civîna çapemeniyê de li balafira serokatî qewimî, dema Trump êrîşî rojnamevanekî kir piştî pirsa li ser Îranê û wî wekî ‘ehmeq’ pênase kir, di dîmenekê de ku yek ji mijarên herî tê nîqaşkirin di siyaseta nûjen a Amerîkî de careke din anî ber çavan: têkiliya aloz a di navbera Trump û rojnamevanan de û sînorên axaftina siyasî li hember medyayê. Ew wekî beşek ji kesayetiya Trump an jî wekî gefeke rasterast li ser nirxên azadiya çapemeniyê tê dîtin.

**Bûyera dawîn:**

Di meha Nîsanê de êrîşeke nû di balafira serokatiya Amerîkayê de bû, di dema axaftina xwe ya bi rojnamevanan re, ji Trump hat pirsîn gelo ew gefên Îran bi awayekî cidî digire dest. Bersiva wî rasterast li ser cewhera pirsê tunebû, lê berê xwe da ser çavkaniya wê û bi destnîşan kir ku pirs ji nûçegihanê CNN’ê hat kirin. Trump bi dengekî pêkenok got, “Ez wisa difikirim, rast e, CNN ?” Piştre wî pirs bi rengekî pêkenok dubare kir berî ku gotina xwe ya navdar bibêje: “Çi pirsek ehmeqî ye.” Trump li şûna ku bersiveke siyasî ya rasterast bide, wî lîsteya operasyonên leşkerî yên berê yên Amerîkayê nirxand, di nav de kuştina fermandarê Feyleq Elquds a Îranê Qasim Suleymanî di sala 2020 de, herwiha êrîşa esmanî ya ku serçeteyê DAIŞ’ê Ebû Bekir Elbexdadî li Sûriyê di sala 2019’an de hate kuştin û operasyona serokê Venezuelayê Nicolás Maduro destnîşan kir. Paşê wî dîsa tinazên xwe bi pirsê kir.

**Zincîreke dirêj ji êrîşên Trump li ser rojnamegeran**

Bûyera herî dawî tenê beşeke nû ye di zincîreke dirêj a rûbirûbûnên di navbera Trump û çapemeniya Amerîkî, bi taybetî rojnamevanên jin e. Di meh û salên borî de, Trump êrişên bi gotinan ên rasterast li ser hejmarek rojnamevanên jin pêkanîn, di nav de, nûçegihanê CNN Caitlan Collins, ku wî gelek caran li ser platforma xwe ya Truth Social wekî “bêaqil û nefret” pênase kir, bi zanebûn navê wê şaş nivîsand.

-Nûçegihana CBS Nancy Cordes, ku wî di konferanseke rojnamevanî de got, “Ma tu ehmeq î?”

-Rojnamevana New York Times Katie Rogers jî bû armanca êrişên Trump, piştî wê raporek li ser karnameya Trump nivîsand, lewma wî Katie Rogers bi kirêtbûnê ango



bi qebhetbûnê pênase kir.

-Nûçegihana ABC News Mary Bruce jî rastî êrişê hat, pirsa wê wekî pirseke tirsnak, sorkirina li dijî Amerîka û pir xirab pênase kir.

-Rojnamevana Bloomberg Catherine Lucey jî yek jinên rojnamevan, ku Trump bi gotineke heqaret jê re got, “Aram be, berazê”

**Çima Trump êrîşî çapemeniyê dike?**

Êrîşên Trump beşek ji stratejiya siyasî armanca wê ew e ku çapemenî wekî dijberekî siyasî were nîşandan, hem jî da ku Trump wekî serkêşekî dijberê saziyên raghandinê derkeve pêş. Di heman demê de da ku baweriya kolana Anmerîkî bi ragihandinê neyê kirin û wê weke ragihandina kilasîk bibîne. Trump xwe dispêre rûbirûbûna devkî da ku balê bikişîne û nîqaşê ji naveroka pirsan veguherîne rojnamevan bixwe, pirî caran jî Trump serkeftî dibe di warê xwederxistina manşetan de. Alîgirên Trump çapemeniyê wekî çapemeniyeke bêalî nabînin û dibêjin çapemenî hêjayî bersiveke tund e. Li hêleke din parêzvanên azadiya çapemeniyê van êrîşan wek gefeke rasterast li ser demokrasiyê dibînin. Saziyên medyayê bi gelemperî bersivê didin van bûyeran, ev yek jî bi riya daxuyaniyên şermezarkirinê yên fermî, piştevaniya profesyonel bi rojnamevanên ku hatine armanckirtin re weşanê didomîne bêyî ku radeya rexneyê tund bibe.

**Azadiya ragihandinê di xetereyê de ye**

Êrişên Trump li ser rojnamevanan pirsên kûr derdixin, sînorên axaftina siyasî ya li hemberî çapemeniyê bandora zordariya peyv û gotinan li ser ewlehiya rojnamegeran dike, di heman demê de rojnamevan nikarin bi azadî di warê rojnamevaniyê de tevbigerin. Dubarekirina vê siyasetê, bi taybetî ji kesayetek serokê berê, niha û dibe ku bibe serokê siberojê, dikare atmosferek dijminane biafirîne ku bandorek neyînî li azadiya karê rojnamevaniyê bike. Êrîşa dawî ya Donald Trump a li dijî nûçegihaneke jin di hevpeyvînê de ne bûyereke ji rêzê ye, lê belê dirêjkirina nêzîkatiyeke demdirêj e ku li ser rûbirûbûna bi çapemeniyê re, bi taybetî bi rojnamevanên jin re ye. Di navbera kesên ku vê yekê wek şêwazekî serkeftî dibînin û yên ku ji bo nirxên demokratîk xetere dibînin, pirs di nav civaka Amerîkayê de dimîne. Pirs ev e ku gelo medya axaftinên bi vî rengî wekî beşek ji lîstika siyasî digire, an jî dem hatiye ku sînorên zelal ji heqaretê re were parastin?

**Piştî hatina Trump bi 100 rojan, gelek astengî ji qada ragihandinê re derketin**

Di sed rojên pêşîn ên serdema duyem a serokatiya Donald Trump de, wî bala xwe da ser pêkanîna gefên ku wî di dema kampanyaya hilbijartinê de li dijî saziyên medyayê kiribû, ji ber ku wî soz da ku hikumeta federal wekî çekekê li dijî rojnamevanan weke dijminên xwe bikar bîne û bi şexsî û fermî êrişî medyayê li Dewletên Yekbûyî û li seranserê cîhanê kir. Wî li pêşberî girseya alîgirên xwe li Michigan, bi boneya sed roja vegera wî ya Koşka Spî, wî ragihandin wekî sextekarekê pênase kir. Li ser vê boneyê, rêveberê Ofîsa Amerîkaya Bakur a Rêxistina Nûçegihanên Sînornenas, Clayton Warners got, “Tevlîheviya rojane ya di nûçeyên siyasî yên Amerîkî de dibe ku nirxandina guhertinên radîkal ên berdewam ji bo me zehmet be. Lê dema ku em rewşa giştî dinêrin, şêwazê derbeyên li azadiya çapemeniyê zelal dibe.” Warners di daxuyaniyekê de ji bo rêxistinê bal kişand ser redkirina wan a êrîşa mezin a li ser azadiya çapemeniyê. Wî soz da ku eşkerekirina êrîşên li ser çapemeniyê û her tiştê ku ji destê wan were ew ê bi erkê xwe rabin.

Nûçegihanên Sînornenas û malperên nûçeyan ên Amerîkî piştî zêdeyî sê mehên ji hatina Donald Trump rewşa ragihandina Amerîkî nirxandin.

Li gorî raporên rêxistin û malperên Amerîkî hat diyarkirin ku 427 melyon şopîner li ser asta her heftiyekê ragihandinê dişopînin. Piştî ku Donald Trump dest bi kar kir 8 hezar rûpelên ku ji zêdetirî 12 malperên hikumetê hatin sîlkirin, di encamê de rojnamevan û şopîner ji zanyariyên girîng ên li ser tenduristî, ewlehî û mijarên din mehrûm man. Li hêleke din 180 radyoyên gelemperî yên ku gefa rawestina kar xwarin, di wê demê de rapor nîşan dan ku rêveberiya Trump plan dike ji Kongreyê bixwaze ku 1.1 milyar dolar ji fonên xizmeta weşana giştî ya hatibû veqetîne.

Di heman demê de 74 rojan Ajansa Associated Press ji Koşka Spî hate qedexekirin ji ber ku wê peyva Kendava Meksîkayê bi kar tanî, Trump Kendava Amerîka vî navî bi kar tîne. Herwiha 64 şîroveyên êrîşkar ên Trump li ser platforma Truth Social ji dema sondxwarina xwe ve kirin. Ji bilî êrîşên şexsî yên birêkûpêk ên li dijî medyayê di konferansên çapemeniyê û axaftinên giştî de, Trump hema hema her roj platforma xwe bi kar tîne da ku heqaret bike, gef bike an jî rojnamevan û xebatkarên medyayê yên ku wî û rêveberiya wî rexne dikin bitirsîne. Li aliyekî din 6 lêpirsînên ji hêla Komîsyona Ragihandinê ya Federal (FCC) ve li dijî saziyên medyayê yên wekî CBS û Disney, şîrketa ABC, Comcast, şîrketa NBC, weşanên giştî NPR û PBS û tora televîzyonê ya KCBS li California hatine kirin. Herwiha 4 dozên şexsî yên Trump li dijî saziyên medyayê yên CBS, rojnameyên Des Moines Register û Gannett, û Navenda Pulitzer hatin pêşkêşkirin.

**Di milê zagonî de parstina rojnamevan û rojnamegeriyê?**

Xebatên rojnameger û pisporên din ên di medyayê de dixebitin bi gelemperî rastî astengiyên wekî çavtirsandin, destdirêjî û tundûtûjiyê tên. Wekî ku di biryara Konseya Ewlekariyê ya 2222 a sala 2015’an, biryara Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ya hejmara 33/2 ya 29’ê Îlona 2016’an û biryara Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ya 70/162 ya 17’ê Kanûna Pêşîn a 2015’an de, van kiryaran pênase dike, herwiha li ser ewlehiya rojnamegeran û mijara bêcezabûn tekez dike û ev biryar bang li dewletan dikin ku ji bo çareserkirina van xetereyan tedbîran bigirin. Herwiha biryara UNESCO’yê ya hejmar 29 şermezarkirina tundiya li dijî rojnamegeran ya 12’ê Mijdara 1997’an û Ragihandina Medellînê ya Ewlekariya Rojnamegeran û Têkoşîna li dijî Bêcezabûna wan ku ji hêla UNESCO’yê ve di 4’ê Gulana 2007’an de hat qebûlkirin, biryara Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ya hejmar 12/16 ji bo azadiya raman û derbirînê ya 30’ê Îlona 2009’an hem jî biryara 21/12 ya 27’ê Îlona 2012’an a li ser ewlehiya rojnamegeran, herwiha biryarên Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî yên bi hejmara 68/163 ya 18’ê Kanûna Pêşîn a 2013’an û 69/185 a 18’ê Kanûna Pêşîn a 2014’an li ser ewlehiya rojnamegeran û mijara bêcezabûnê, tekeziyê li ser parastina rojnamevanan dikin. Terzê Donald Trump rengek ji rengê hedefgirtinê ye, ev yek jî dihêle astengî ji rojnemevan û saziyên çapemeniyê re derkevin, lewma jî divê Trump van biryarên cîhanî yên ku qada çapemenî û ragihandinê diparêze, li ber çavan bigire û li gorî wan tevbigere.



Gulîstan Xalid

## 1’ê Gulanê: Ji Rojava heta Sûriyê berxwedana bi ked û azadî

1ê Gulanê serî rakirina dîrokî ya çîna karkeran li dijî sîstema kapîtalîst a îstîsmarê ye. Ev serî rakirin ne tenê daxwazek ji bo mûçeyên çêtir an şert û mercên xebatê ye; di heman demê de nerazîbûnek bingehîn a li dijî îstîsmara mirov ji hêla mirov ve ye. Îro, ev nerazîbûn li Sûriyeyê, bi taybetî li Rojava, bi awayekî herî tûj û rastîn deng vedide. Şerê li Sûriyeyê, ku bi salan e dom dike, ji ber pevçûna berjewendiyan di navbera hêzên emperyalîst û desthilatdariyên herêmî de jiyana mirovan perçe kiriye. Ev şer ne tenê wêrankirina di warê leşkerî de ye; di heman demê de desteserkirina sîstematîk a li hemberî hêza hilberînê, hêviya jiyanê û pêşeroja gelê kedkar e. Ji bo karker, cotkar, bindest û feqîran, êdî ked ne tenê hilberîn bûye, lê têkoşînek xwerû ya ji bo mayîna jiyanê ye.

Tam di nava tarîtiya siyasetên di herêmê de Şoreşa Rojava derket holê, ku îdîa dikir ku rihê 1ê Gulanê vediguherîne rastiyek berbiçav. Sîstema ku li Rojava hatiye damezrandin, li ser bingeha keda kolektîf, hilberîna hevpar û edaleta civakî ye, berevajî avahiya takekesî û îstismarkar a modernîteya kapîtalîst. Hilberîn, ku bi rêya komîn û kooperatîfan tê organîzekirin, armanc dike ku kedê ji kelûpelekê veguherîne hêzek damezrîner a jiyana civakî.

Di vê xalê de, ezmûna Rojava, berevajî pratîkên sosyalîst ên klasîk, ku ne tenê li ser rizgariya çînî, lê di heman demê de li ser azadiya zayendî jî disekine û vê weke rêgezeke ku digre navenda têkoşîna şoreşa azadiyê ya ku bi keda civakî tê pêşxistin. Keda jinan li vir karekterek şoreşgerî digire. Jin ne tenê dibin xwediyê hilberînê, lê di heman demê de dibine xwedî roleke çalak ya rêvebirin û parastinê jî, û li dijî serweriya sedsalan a pergala serdestiya mêran şikestinek dîrokî diafirînin.

Lêbelê, ev ceribandina şoreşgerî di bin dorpêçê de ye. Ambargo, êrîşên leşkerî û tecrîda siyasî armanc dikin ku modela alternatîf a ku ji hêla Rojava ve hatî afirandin bifetisînin. Ji ber ku pergala ku li Rojava tê avakirin ne tenê ji bo pergala kapîtalîst a herêmî, lê di heman demê de ji bo pergala kapîtalîst a cîhanî jî gef e. Ji ber vê yekê, 1ê Gulanê li Rojava ji cejnekê wêdetir e; ew meydanek têkoşînê ye, serkeftinek e ku were parastin, berxwedanek e ku were xurt kirin.

Rewş li seranserê Sûriyeyê jî pir xirab û xwedî tabloyeke girane. Bi milyonan kes koçber bûne, amûrên hilberînê wêran bûne û civak ketiye nav xizaniyeke kûr. Di bin van şert û mercan de, Yekê Gulanê ne tenê bîranîneke rabirdûyê ye; ew bangeke pêwîst e ji bo ji nû ve rabûnê. Têkoşîna kedê heya ku bi têkoşîna dijî şer re neyê hevgirtin dê kêm û nîvço bimîne.

Dengê ku îro ji Rojava bilind dibe ev e: Azadî bi keda rêxistinkirî mimkun e. Û rastiya ku ji xirbeyên Sûriyeyê bilind dibe ev e: Bê ked jiyan nabe, bê berxwedan azadî nabe. Ji ber vê yekê, 1ê Gulanê ne tenê rojek e li van axan; ew têkoşînek berdewam e. Ew ne dirûşme ye; ew şêwazek jiyanê ye. Ew ne bîranînek e; ew îradeya avakirina pêşerojê ye.



# Ji destpêka salê ve Rûsya 1700 $km^2$ ji xaka Ukraynayê kontrol kiriye

Hêzên Rûsyayê di şerê li dijî Ukraynayê de stratejiya “êrîşên biçûk yên li pey hev û domdar” bi kar tîne, di encamê de ji destpêka salê ve artêşa Rûsyayê zêdetirî hezar û 700 $km^2$ û 80 deverên niştecihbûnê ji axa Ukraynayê kontrol kiriye.

**Navenda Nûçeyan**

ji ber mijûlbûna Amerîkî bi şerê bi Îranê re, artêşa Rûsyayê êrişên xwe yên li dijî Ukaraynayê bi awayekî domdar dewam dike. Herî dawî Hêzên Rûsyayê herêmên Grishchino û Pavlovka yên Ukraynayê control kirin, herwiha operasyona paqijkirina herêma Novi Donbas ber bi temambûnê ve diçe û şer li Beletskoye berdewam dike. Hin hêzên Rûsyayê ber bi Dobropyla ve pêşve diçin û li herêma Dnipropetrovsk xeteke ewlehiyê ava dikin. Li gorî Serfermandariya Giştî, ji sedî 75 zêdetir axa herêma Novopavlievka a Ukraynayê ji aliyê artêşa Rûsyayê ve hatiyekontrolkirin û ewlekirin.



Serfermandarê Giştî yê Hêzên Leşkerî ên Rûsyayê Valery Gerasimov ragihand ku hêzên Rûsyayê kontrola xwe berfirehtir dikin, ji destpêka salê ve zêdetirî hezar û 700 kîlometreçargoşe û 80 deverên niştecihbûnê yê Ukraynayê kontrol kirine, bi vî rengî tevahiya axa Komara Gel a Luhanskê jî hatiye kontrolkirin.

Valery Gerasimov destnîşan kir ku êrîş li hemû eniyan berdewam e, şer berdewam dike ji bo kontrolkirina çend bajaran, di nav de Krasny Liman û Konstantinovkayê. Ev tê wateya ku Rûsya hewl dide tevahiya herêma Donbasê ku parêzgehên Luhansk û Donetsk ên Ukraynayê jî di nav de ne, kontrol bike. Di dema borî de DYE pêşniyar kiribû ku Ukrayna dev ji van deveran berde da ku bigihîje çareseriyekê bi Rûsyayê re, lê Ukrayna ev daxwaz red kir. Gerasimov piştrast kir ku di Adar û Nîsanê de, herêma kontrolê berfireh bûye û 34 wargehên din û bi qasî 700 kîlometreçargoşe di nav xwe de digire. Wezareta Parastinê diyar kir ku niha li gelek eniyan operasyonên leşkerî didomin.

Niha jî yekîneyên Artêşa 3yemîn yên Rûsyayê li ser eniyeke fireh ber bi Sloviansk û Kramatorsk ve ber bi rojava ve pêşve diçin. Li gorî Fermandariya Giştî, yekîneyên leşkerî niha bi rêzê ve bi qasî 12 û 7 kîlometreyan ji derdora rojhilatê van bajaran dûr in, di heman demê de pevçûn li kolanên Kryvya Luka berdewam dikin.

**Ukranya idiayên Rûsyayê red dike**

Ji aliyê xwe ve, Ukraynayê daxuyaniyên Wezareta Parastinê ya Rûsyayê, bi taybetî yên di derbarê kontrola tevahî herêma Luhanskê ji aliyê Rûsyayê ve red kir û got ku hêzên wê di êrîşên dijber ên di du mehên borî de karîn 480 kîlometreçargoşe li herêma operasyonên leşkerî ji nû ve kontrol bikin.

Raportên berê nîşan didan ku artêşa Rûsyayê kontrola hema bêje tevahî ya bajarê Mirnohrad li herêma Donetskê bi dest xistiye, topxane û binesaziya dronan li wir bi cih kiriye. Hêzên parastinê li çeperên xwe yên li derdora bakurê bajêr asê mane.

Di demên dawî de hate ragihandin ku Rûsyayê êrîşên xwe li seranserê xeta pêşîn zêde kiriye, lê belê kiryarên bi vî rengî ne mimkûn e ku bandorek mezin li ser rêça giştî ya êrîşa bihar û havîna 2026’an bikin.

Rûsya berdewam israr dike ku hêzên Ukraynayê bi tevahî ji Donbasê vekişe, tevî herêmên ku hîn negirtine. Kîevê bi berdewamî diyar kiriye ku ew vê yekê qebûl nakin.

Serokê Ukraynayê Volodymyr Zelensky di hevpeyvînek çapemeniyê de rave kir ku vekişîna leşkerên Ukraynayê ji Donbasê dê ji bo Kîevê têkçûnek stratejîk be.

Zelensky destnîşan kir ku ev herêm ji bo parastinê pir girîng e, ji ber ku xetên parastinê û kelehên wê hene, herwiha windakirina van cihan dê hêzên çekdar ên Ukraynayê bi giranî qels bike.

**Putin di şerê Ukraynayê de bi israr e**

Di civînekê de bi nûnerên şaredariyê re di çarçoveya merasîma Xelata Xizmeta Şaredariyê ya Hemû-Rûsyayê de, Putin diyar kir ku welatê wî ji bandorên potansiyel ên krîza li Ukraynayê haydar e. Lêbelê, hikûmeta Rûsyayê niyeta wê nîne ku vê mijarê bi eşkereyî nîqaş bike û dê gavên pêwîst bavêje da ku bigihîje armancên xwe li ser erdê. Wî baweriya xwe ya tevahî bi bidestxistina armancên operasyona ewlehiyê ya taybet anî ziman. Putin piştrast kir ku Kîev ji niha ve difikire ka ger Rûsya bi ser bikeve, dê çawa rewşê birêve bibe. Wî got, “Belê, erê, ew her tiştî temam dikin. Em ê bibînin ka çi dibe. Em dizanin ka her tişt dê çawa bi dawî bibin. Em ê tenê ji bo pêkanîna armancên ku me ji xwe re danîne bixebitin û hewl bidin ku wan bi dest bixin. Ez bawer im ku ew ê werin bidestxistin.”

**Stratejiya nû**

Di mehên borî de, hêzên Rûsyayê stratejiya “êrîşên li pey hev û domdar”dide meşandin. Ew êrîşên piçûk lê domdar û pêşveçûnên hêdî hêdî pêk tîne. Analîstên leşkerî destnîşan dikin ku Rûsya bi awayekî sîstematîk tevdigere, hêdî hêdî bêyî ku daxuyaniyên ji nişka ve û êrîşkar bide, metirsiyê bilind dike û her dewreyeke nû ya şer bi pêşniyareke din bi dawî dibe ku ji bo dijmin her ku diçe nayê qebûlkirin, wekî ku gelek pisporên Rûs nivîsandine.

Ji ber vê yekê, şerên dijwar li eniyê berdewam dikin, bi armanca kontrolkirina bajarê Beletskoy, ku ketina wî di dawiyê de dê bibe sedema hilweşîna xeta pêşîn a parastinê ya Hêzên Çekdar ên Ukraynayê li vê herêmê.

# Pêwîstiya stratejîk a yekîtiya neteweyî

**Botan Amed**

Rêwîtiya dîrokî ya gelê Kurd ne tenê bi destwerdanên derve, lê di heman demê de bi parçebûna navxweyî jî şekil girtiye. Ev parçebûn gelek caran bi rêya cudahîyên îdeolojîk, berjewendîyên herêmî û hesabên siyasî yên demkurt kûrtir bûye, di encamê de avakirina îradeyeke neteweyî ya kolektîf bi berdewamî dereng dixe. Ya ku îro eşkere ye ev e ku yekîtiya neteweyî ne hilbijartinek e, lê pêdiviyek stratejîk e. Mîmariya siyasî ya heyî ya Rojhilata Navîn avahiyên parçebûyî û nehevrêz qebûl nake; berevajî vê, ew wan qels dike, wan bêbandor dike û wan ji destwerdana aktorên derve re dike xeternak. Rastiya ku avahiyên siyasî yên Kurd ji hev cuda tevdigerin ne tenê potansiyela wan sînordar dike, lê di heman demê de destkeftiyên ku hatine bidestxistin jî qels dike. Ev çerxek e ku di seranserê dîrokê de gelek caran dubare bûye. Astengiya herî mezin a li pêşiya yekîtiya neteweyî nekarîna birêvebirina cudahîyan e. Mutleqkirina dabeşbûnên îdeolojîk, her avahî xwe wekî navend dibîne û yên din wekî duyemîn an reqîb bi cih dike, pêşxistina stratejiyeke hevpar ne mumkin dike. Heta ku ev nêzîkatî berdewam bike, bangên ji bo yekîtiyê dê di asta retorîkî de bimînin. Yekîtiya neteweyî ya rastîn nayê wateya komkirina hêzê di yek destî de; berevajî vê, ew tê wateya hevrêzkirina hêzan. Sê hêmanên sereke ji bo bidestxistina vê hevrêziyê pir girîng in. Ya yekem, naskirina hevbeş a rewatiyê pir girîng e. Aktorên siyasî yên cuda dikarin ne bi paşguhkirina hev, lê bi qebûlkirina hebûna hevdu xalên hevpar bibînin. Di hawîrdorekê de ku krîza rewatiyê nehatiye derbaskirin, tu projeyek yekîtiyê domdar nîne. Ya duyemîn, zelalkirina armancên stratejîk ên hevpar pir girîng e. Armancên nezelal û nezelal bi lez nakokî çêdikin. Armancên zelal, konkret û lihevkirî hevkariya di navbera avahiyên cûda de hêsan dikin. Divê ev armanc bi destkeftiyên siyasî yên konkret werin destnîşankirin ne bi retorîka hestyarî. Ya sêyemîn, sazûmanîkirin pir girîng e. Li şûna têkiliyên demkî û nazik ên ku bi kesan ve girêdayî ne, avahiyên ku bi mekanîzmayan têne ewlekirin pêdivî ne. Yekîtî bêyî pêvajoyên biryargirtinê yên hevbeş, mekanîzmayên çareserkirina krîzan û kanalên diyalogê yên birêkûpêk nayê domandin. Lêbelê, divê bandora aktorên derveyî neyê paşguh kirin. Hêzên herêmî û cîhanî pir caran meyla wan heye ku avahiyên parçebûyî manîpule bikin da ku xizmeta berjewendiyên xwe bikin. Ji ber vê yekê, yekîtiya neteweyî ne tenê meseleyek navxweyî ye, lê di heman demê de amûrek ji bo hevsengkirina destwerdanên derveyî ye jî. Aliyê civakî bi qasî aliyê siyasî girîng e. Tu yekîtî bêyî piştgiriya gel nikare domdar be. Însiyatîfên ku tenê di nav elîtan de, bêyî ku beşên cûda yên civakê tevlî bibin, zû rewatiyê winda dikin. Ji ber vê yekê, divê yekîtiya neteweyî bibe hişmendî û daxwazek berfireh. Ji ber vê yekê, di şert û mercên heyî de, yekîtiya neteweyî ne îdealek romantîk e, lê meseleya avakirina hêzek konkret e. Ev hêz tenê dikare were bidestxistin dema ku avahiyên parçebûyî ji sînorên xwe derbas bibin, berjewendiyên teng ên xwe bidin aliyekî û li ser perspektîfek pêşerojek hevpar li hev bicivin. Wekî din, dîrok xwe dubare dike: hêzên parçebûyî avahiyên ku xurt xuya dikin lê di rastiyê de nazik in, diafirînin. Û ev nazikî di kêliyên herî krîtîk de dibe diyarker.

# 1’ê Gulanê roja çirûska têkoşîna karkeran li seranserî cîhanê

Her sal 1’ê Gulanê weke ‘Roja Karkeran a Cîhanî’ tê pîrozkirin. Cara pêşîn di 1’ê Gulana 1890’î di kongreya duyemîn a Enternasyonalîstên Sosyal de ev roj hate ragihandin. Mebest jî vê rojê ew e ku dawî li kedxwariyê were anîn û mafê karkeran misoger bibe. Lê heya roja îro li Rojhilata Navîn û cîhanê mafê karkeran tê xwarin û edalet pêknehatiye.

Ronahî Sadûn




Di sedsala 19’an de, karker di şert û mercên xebatê yên tirsnak de dixebitîn. Li dijî kedxwarî û binpêkirinan, di serî de li Awustiraliya piştre li Amerîkayê çalakiyên dev ji kar berdanê hatin lidarxistin. Di sala 1886’an de jî li qada Haymarket ya li Chicagoyê ji bo seatên kar bibin 8 Karkeran xwepêşandan lidarxistin. Ji wê demê û şûna ve, bi qasî 5 hezar girev ku bêtirî 340 hezar karker tevlîbûn pêk hatin. Herî dawî bi berdêlên mezin hewldanên wan bi ser ketin. Li vir mafên wan li ser asta navneteweyî û herêmî bi rêya peyman û qanûnan hatin misogerkirin.

**Ji bo rastiya 1’ê Gulanê were fêmkirin, hewceye mirov ji dîroka wê dest pê bike û nas bike ku gelo çima ev roj?**

1’ê Gulanê bi roja pîrozkirina Karkeran a Cîhanê tê naskirin. Dîroka rehên vê rojê diçin sala 1886’an li bajarê Chicago yê Amerîkayê. Ji ber ku di sedsala 19’an de li Ewropa û Amerîkayê, karker di bin şert û mercên mîna “koletiya nûjen” de dijiyan. Di wê demê de karker di bin şert û mercên pir giran de bûn, carinan rojê 12 heta 16 saetan dixebitîn. Li hemberî vê yekê karkeran di bin dirûşmeya “8 saet kar, 8 saet bêhnvedan, 8 saet perwerde û jiyana taybet” dest bi greveke mezin kirin. Di 4’ê Gulana 1886’an de jî, di dema xwepêşandanekê de li Meydana Haymarket, teqînek çêbû û polîsan gule berdan girseyê. Gelek karker hatin kuştin û birîndar kirin. Ev bûyer bi navê Bûyera Haymarketê hat binavkirin û bû çirûska têkoşîna karkeran li seranserî cîhanê. Piştî vê, 4 pêşengên karkeran (Albert Parsons, August Spies, Adolph Fischer, û George Engel) hatin darvekirin. Di sala 1889’an de, Kongreya Sosyalîst a Navneteweyî (Îmternasyonala Duyemîn) biryar girt ku ji bo bîranîna van şehîdên karker, 1’ê Gulanê wek “Roja Piştgirî û Têkoşîna Karkeran a Cîhanê” bê pîrozkirin.

**1’ê Gulanê gihandina dengê karkeran ji hemû cîhanê re bû**

Cara yekem ev roj “Roja Karkeran” di sala 1890’î de li gelek welatan hat pîrozkirin. Li piraniya welatan ev roj bi xwepêşandan û meşên aştiyane tê pîrozkirin. Karker û sendîkavan dadikevin qadan û daxwaza baştirkirina şert û mercên kar û naskirina mafên xwe dikin. Xwepêşandan li her welatkî ji welatên din cûda ye, lê ew hemû bangek hevpar dikin. Li hin welatan çalakiyên çandî û pêşangehên girêdayî mafên karkeran tên lidarxistin. Li hin paytextên mezin jî meşên girseyî bi beşdariya hezaran kesan tên lidarxistin. Li hin welatan jî hin sîstemên siyasî hîn nedemokratîk in, an jî mafên mirovan nayên parastin. Lewma jî 1’ê Gulanê dibe derfetek ji bo gihandina dengê karkeran li dijî polîtîkayên hikumetê yên ku azadiya wan sînordar dike û rê li ber çalakiyên aştiyane digire. Roja Karkerên Cîhanê ne tenê roja bêhinvedanê ye. Lê derfetek e ku em vegerin ser koka têkoşîna ji bo mafên karkeran. Nerazîbûna li dijî newekheviya civakî, aborî û tekez kirina ku kar ne bar e. Lê ew mafeke bingehîn e û rêyek e ji bo bidestxistina edalet û rûmetê.

**Herkîna karkeran ji bo pîrozkirina roja xwe**

Bi mîlyonan karker û kedkar li seranser cîhanê diherikin qad û kolanan û roja xwe Roja 1’ê Gulanê ku Roja Karkeran e, pîroz dikin. Herwiha di vê rojê de, karkerên cîhanê û sendîkayên wan daxwaza baştirkirina şert û mercên xwe yên xebatê dikin, di heman demê de daxwaza xurtkirina mafên xwe û zêdekirina mûçeyan dikin. 1’ê Gulanê li gelek welatên cîhanê wekî cejna fermî û li gelek welatên din jî bi awayekî pratîkî tê pîroz kirin.

**Pirsgirêkên nûjen**

Her çiqas 8 saet kar îro li ser kaxezê qanûnî be jî, girêdana vê rojê bi roja îro re hîn zindî ye. Ji ber gelek mafên ku em îro wekî tiştên asayî dibînin (wek 8 saet kar û betlaneya heftane) encama wê têkoşîna 1’ê Gulanê ne. Lê îro karker bi pirsgirêkên nû re rûbirû ne; wek karkirina bi mûçeyên kêm, xebata zarokan û windabûna mafên sendîkayî. Bi sîstema nû ya kar sînorên saetên kar dîsa tevlihev bûne. 1’ê Gulanê îro bîranînek e ku maf nayên dayîn, lê tên girtin. Ev roj di asta cîhanê de nîşan dide ku karkerên ji netewe û olên cuda xwedî heman êş û armancan in. Lê 1’ê Gulanê ne tenê rojeke dîrokî ye, lê her sal tîne bîra me ku rûmeta mirov ji qezencê mezintir e.

Krîza aborî û mûçeyê kêm: Îro li gelek welatên Rojhilata Navîn mûçeyên karkeran di bin sînorê birçîbûnê de ne. Ji ber vê yekê, 1’ê Gulanê îro veguheriye rojeke daxwaza edaleta dabeşkirina dahatê.

Mafên jinan: Di sala 2024-2025’an de hîn cudahiya mûçeyan di navbera jin û mêran de mijarên sereke yên protestoyan in. Lewma heta edalet pêk neyê, têkoşîna ku di sala 1886’an de dest pê kiriye, wê bidome.

Karkirina zarokan: Li gorî raporên navneteweyî, îro li cîhanê hîn jî bi mîlyonan zarok di karên giran de têne xebitandin, ev jî binpêkirina mafên navneteweyî yê zarokan e.

**Rêber Apo mîrasa nirxê rasteqîn ê tevahî kedkarên herêmê û cîhanê geş kir**

Tevî ku roja karkeran bi fermî hatiye pijrandin, lê dîsa jî li cîhanê beşa karkeran herî zêde bi êş, zilm, înkarkirin û çewsandinê re rû bi rû dîmin. Li piraniya welatan peymana 1’ê Gulanê hatiye imze kirin. Lê mixabin çîna karker û kedkaran rastî astengî û bêmafiyê tên. Lê bi derketina Tevgera Azadiya Kurdistanê re, wateyekî nû li kedê hat barkirin. Çîna karkeran ku tîyê vîna azad e li hemberî pergalên kapîtalîst xwe birêxistin kir, da ku wekhevî û edaleta civakî pêk bîne. Ji salên 1970’yî û vir ve Rêber Apo rih û mîrasa nirxê rasteqîn ê tevahî kedkarên herêmê û cîhanê geş kir. Di civakê de pir kedkar hene ku bi hêza zendê wan em dijîn, nan dixwin û rihet radikevin. Li vê deverê, mafê ku gel û taybet jin jê mehrûm bûn, îro roj tê bidesxistin. Wisa jî bi kedeke mezin, em hatin van rojan.

**‘Heta ku yek ji me ne azad be, tu kes ji me ne azad e’**

Di sedsala niha de cîhan di navbera krîzên aborî û şerên herêmî de rû bi rû ye. Lê wekî ku di sala 1886’an de karkeran gotibû; “Heta ku yek ji me ne azad be, tu kes ji me ne azad e.” Ev yek jî nîşan dide ku ked ne tenê çalakiyek fizîkî ye, lê ruhê şaristaniyê ye. Heta ku edalet nebe bingeha cîhanê, qîrîna “Bijî 1’ê Gulanê” dê li her kolan bê berizandin.

## Tifaqa Neteweyî



Farûk Sakik

26’ê Nîsanê li ji hêla Înîsiyatîfa Yekîtiya Demokratîk li Amedê konferansek ji bo yekîtiya netewî hat lidarxistin. Konferans bi navê “Kurdên Bakur yekîtiya xwe ya neteweyî nîqaş dikin” bû.
Dîroka Kurdistanê ne tenê dîroka şeran e, ew dîroka hewldana yekbûnê ye jî ango yek ji pirsgirêka bingehîn a gelê Kurd, pirsgirêka yekîtiyê ye.
Dîroka Kurdistanê, wekî çiyayên wê, bi serbilindî û birînên kûr hatiye hûnandin. Di nav rûpelên vê dîrokê de, ji sedsala 17’an heta îro, dengek heye ku tu carî nesekiniye. Ew deng, dengê yekîtiyê ye. Li hemberî lîstik û êrişên dagirkeran ev stûn, parastina berjewendiyên giştî yên Kurd û Kurdistanê ye. Hemû serok û rêberên kurd ji destpêkê heya kêliya jiyana xwe ya dawîn ji bo xurtkirina vîna netewî têkoşiyane.
Bi taybet di dawiya hemû serhildanan de pêşengê serhildanan dema dihatin îdamkirin, an jî di dawiya jiyana xwe de bangî gele Kurd dikirin da ku yekîtiya xwe ava bikin.
Rast e di serhildanan de yekîtî ava nedibû. Ji bo ku serhildan hemû herêmî bûn.
Dema serhildanan de kes li hawara kesî jî nediçûn. Hin caran li hin devaran ji bo dahilî serhildanan bibin bi rê diketin. Lê mixabin dijmin pêşî li vê hewldanên wan digirt. Dijminên Kurdistan, li aliyek bi ser serhildanê ve diçûn, li aliyek jî pêşî li hewldanên yekîtiya navbera Kurdan digirt.
Di roja me de hişmendiya Rêber Apo vê dozê gihand asteke stratejîk û felsefî. Ew hewl di de berî serhildanan yekîtiyek demokratîk were avakirin. Doza Kurdistan jî bi vê yekîtiyê were çareserkirin.
Beriya şerê çekdarî bide destpêkirin me dît ku di nav gerîla de yekîtiyek ava bûbû. Ji çar aliye Kurdistan ciwan ji bo serhildanê hatibûn û tevlî vê amadekariyê bûbûn. Piştî vê ku ev yekîtî hat avakirin, şerê 15’ê Tebaxê dest pê kiribû.
Di peyama Rêber Apo ya ku ji konferansa Amedê re şandibû de tiştek balkêş hebû. Roja yekem ev di platformên medya dijîtal de gelek hat nirxandin û nîqaşkirin.
Digot; “Belê pergala têkiliyên teng ên eşîrtî, qebîletî û nêzikatiyên teng ên civakê parçe dikin, li pêşiya vê pêvajoyê weke astengiyeke pir mezin disekine. Vê zîhniyetê tevna civakî qels kiriye û rê li ber texrîbatên mezin vekiriye. Heta ku em bi vê rastiyê hevrû nebin, avakirina yekîtiyeke demokratîk jî pêkan nîne”
Ev rewşa serhildanan ku me behs dikir jî ev bû. Serhildan di çarçoveyên teng wek eşîrtî, mezhebî, qebîletî civak parçe kiribû. Bê ku yekîtiyeke netewî were avakirin ji xwe bawerî danîn, dest bi serhildanan dikirin û têk diçûn. Her têkçûn bi xwe re feleketên mezin danîn û ev jî qidûmê civaka Kurd dişkand. Hewledanên yekîtiyê dihatin taloq kirin.
Di şerê ku PKK’ê dabû destpêkirin de yekîtiyek hatibû avakirin. Encam girt û derbasî qonaxek nû dibe. Ev qonax jî pêvajoya avakirina civaka demokratîk e. Ew yekîtiya di salên şer de hatibû avkirin di destpêka sala 2026’an de di şerê Rojava de me kolanên Kurdistan û cîhanê de dît.
Derveyî şer di rewşên wiha de dive seknek çawa hebe Rêber Apo balê dikişine ser vê yeke;
“Hewce ye em di têkiliyên navxweyî de jî ne tundiyê, siyaseta demokratîk û hiqûqê esas bigirin. Rêya yekitiya demokratîk, ji muzakereya demokratîk derbas dibe.”
Ji bo vê yeke ji anha de gelek sazî û dezgehên ji bo avakirina yekîtiya netewî hatine avakirin. Divê ev sazî û rêxistin dibin sîwanek de werin gel hev. Ew sîwan jî KNK ye.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî



Can Yûsiv

Helbestvan Ayjan Gorî sembola jina Kurd a ku peyv kir rêya azadiyê ye. Helbestvan Ayjan bi bedewiya tîpên xwe û bi rewanbêjiya wateyên xwe tê cudakirin, lewra peyvên wê bi nermî û dilpakî diherikin dilan, birînan derman dikin û rihetî û aramiyê didin giyan.

Helbestvan û nivîskarên jin ên Kurd di wêjeya Kurdî de roleke sereke lîstin, ji ber ku nivîsên wan ne tenê afirînerî bûn, lê kiryareke çandî ya berxwedanê bû ku alîkarî kir di bilindkirina hişmendiya neteweyî û xurtkirina nasname û girêdanê de, ewan pênûs veguherandin amûrekî têkoşînê û nivîsên wan bûne neynika êş û hêviyên civakê û tomarek zindî ku bîranîna kolektîf diparêze.
Herwiha wan di parastina mîrateya çandî û zimanî ya Kurdî de rolek girîng lîstin, bi riya parastina ziman û veguheztina wê ji bo nifşên nû, bi vî awayî, kar û berhemên wan bûne pirek ku paşerojê bi dema îroyîn re girêdide û nasnameya xwe zindî û nû dike.
Helbestvana Kurd “Ayjan Gorî” yek ji wan helbestvanan tê hesibandin ku pênûs û tîpên xwe terxan kiriye ji bo xizmeta gelê xwe û doza wî, lewra ruhê girêdanê, dengê nasnameyê û dilpakiya derbirîna xem û hêviyên gelê Kurd di nivîsên wê de diyar dibe.
Helbestvana Kurd Ayjan Gorî (Koçerê) di 10’ê Adara 1991’an de li gundê Kêşikê yê herêma Dêrikê, ji dayîk û bavek Kurd (Salih û Xedîce), di malbateke Kurd a kedkar, welatparêz û xwedî nirxên resen û girêdayî ruhê Kurdewariyê de hatiye dinyayê.
Ew di nav malbatek ji neh zarokan pêk tê mezin bûye (pênc xwîşk û çar bira), û di nav wan de ew ya navîn bû, ku vê rewşê jê re ezmûnek malbatî ya hevseng û dewlemend bi girêdana navendî û ruhê civakî pêşkêş kir.

Dê û bavê wê ew li ser nirxên azadî, hezkirina mîrasê, girêdana bi xakê, dilsoziya bi welat û wefadariya bi nasnameyê ve mezin kirine, ev nirxên bingehîn paşê di hişmendiya wê ya wêjeyî û riya afirîner de derketine holê.
Helbestvan Eyjan keça bajarê Dêrikê ye, bajarekî jîndar, dewlemend bi mîrata xwe ya kevnar a çandî û wêjeyî, ku di dirêjahiya dîroka xwe de bûye dergûşa çand û hunerê, û navendeke diyar a helbestvan, nivîskar û hunermendan. Dêrik gelek navên ronî di warê helbesta Kurdî de anîne jiyane, wek (Ehmed Şêx Salih, Omer Elî, Lorî Tildarî û Elî Çil Axa), her weha gelek hunermendên ku şopên zelal di bîra çandî de hiştine jî hembêz kirine, wek (Mihemed Tayib Tahir, Ebdo Elanê, Cemal Sa’dûn û hinên din).

Ev bajar di zinar û kevirên xwe de mîrateya şaristaniyên kevnar ên Mîtaniyan û Hûriyan hildigire, li deşt û çiyayên wê bêhna Sûbarî û Mediyan jê diherike, di dirêjahiya dîrokî ya kûr de ku wê dike qada jiyanê ya bîr û nasnameyan.
Di vê jîngeha dewlemend a çandî de, serpêhatiya Ayjan a wêjeyî, di bin bandora ruhê cih û dirêjbûna wê ya dîrokî û mirovî de despê dike.

Wê zarokatiya xwe li kolanên gundê xwe yê kevnar “Kêşikê” û li ser şînwar û pêmayên “Aşê Keçkê, goristana Keçka Kezî û bermayiyên gundê Kêşika kevnare” derbas kir, ku ev xake çîrokên bav û kalan vedihûne û lehengiya wan ji nifşekê bo nifşekê din re vedibêje, li wir, destpêka wê ya yekem di navbera sadebûna cih û kûrahiya girêdana bi erd û nasnameyê de çêbûye.
Wê îlhama peyvên xwe yên helbestî ji xuşîna kaniyên xweşav ên gund û ji xumxuma çemê Kêşikê wergirtiye û ew di hembêza xwezaya bedew a Kêşikê de mezin bûye, ku lê pirpirîkan dêmên gulan hembêz dikirin û bêhna nanê germ ji malên wan difûriya.
Her wiha hişmendiya xwe ya wêjeyî û çandî jî ji çîrokên dapîrên xwe yên ku di şevên tarî yên zivistanê de vedigotin di girt û ji awazên jinan li zeviyan, ji stranên palevanan yên di demsala çinînê de û ji sirûdên şivanan ên li mêrgan fêr bûye, bi vî awayî ruhê wê ji aheng û çîrokan têr bûye.
Di vê qada dewlemend de, hişmendiya wê ya yekem şîn bû û hezkirina ji bo ax, ziman û nasnameya wê di giyanê wê de derket holê, ev hemû bûne bingeh û tovekî zindî ji bo ezmûna wê ya afirînerî û rêveçûna wê ya wêjeyî.
Ji zarokatiya wê ve, nîşaneyên hestê edebî di hundirê wê de çêdibin, ji ber ku meyla wê ya wêjeyî di sêzdeh saliya wê de dest pê kiriye, dema ku ziman li ber wê asoyên vegotin û vedîtinê vekirin, bi derbasbûna demê re, wê dest bi nivîsandina ramîn û kurteçîrokan kir, di hivdeh saliya xwe de bi awayekî rastîn dest bi karê xwe yê wêjeyî kir, mîna ku wê zû girîngiya peyvê fêm kiribû, wek bîranînek ku qet winda nabe.

Taybetmendiyên wê yên destpêkê di hembêza xwezaya Kurdî û rîtma jiyana rojane a aram de pêk hatin, ew di nav malbateke dilsoz û hevgirtî de, di bin lênerîna diya xwe Xedîce û bavê wê Salih de mezin bûye, ku bi hev re bingehek mirovahî ya xurt ava kirin ku di avakirina hişmendiya wê ya destpêkê de û di xurtkirina hesta berpirsiyariyê ya wê li hember xwe û derdora xwe rolek lîstin.

Eyjan dibistana seretayî û amadeyî di gundê xwe Kêşikê xwend, paşê jî xwendina xwe ya navîn (Lîseyê)di beşa edebî de, di navbera dibistanên Kêşikê û Dêrûna Axê de bi dawî kir, berî ku dest bi xwendina zanîngehê bike di sala yekem de li Koleja Hiqûqê li Zanîngeha Firatê li Hesekê, li wir, hevrêzîyek di navbera perwerdeya qanûnî û dîtina edebî de çêkir, da ku cîhanê baştir fêm bike û ezmûna xwe biafirîne.
Helbestvan Ayjan di destpêkê de berhemên xwe yên wêjeyî bi zimanê erebî di nivîsand û dest bi nivîsandina helbest, gotar û çîrokan kir, di nav qadeke zimanî de ku bû yekem amrazên wê yên îfadekirina xwe û cîhanê, bi pêşketina ezmûna wê û zêdebûna hişmendiya wê ya çandî û mirovî re, nivîsên wê berfirehtir bûn ku bi kûrahiyeke zêdetir nasname û rastiyê îfade bike.
Ji ber hesta xwe ya netewî û girêdana bi nasnameya xwe ve, piştre fêrî zimanê Kurdî bû, hem xwendin hem jî nivîsandin, da ku bibe beşek bingehîn ji amûrên wê yên afirînerî, piştî vegera wê ji Herêma Kurdistanê di sala 2015’an de, tevlî qada perwerdeyê bû û li wir wek rêveberê dibistanê xebitî û çend salan mamostetî jî kir. Di vê qonaxê de, wê di warê çandî û zimanî de xwe bi pêş xist, di zimanê Kurdî de xwe kûr kir û dest bi nivîsandina helbest û çîrokan kir.

Ev guherîn ne tenê veguheztineke zimanî bû, lê berdewamiyeke rêwîtiya ramyarî û ruhî bû ku ziman ji nû ve wek nasname, bîranîn û girêdana xwe nîşan da, ew bû derfetek ku xwe bi du zimanan û bi dewlemendiyeke berfireh di ezmûna xwe ya edebî de îfade bike.
Helbestvan Eyjan helbest bi zimanên erebî û Kurdî nivîsandiye, bi şêwaza helbesta nûjen û helbesta azad ku xwe dispêre rîtma hundirîn û wêneyên helbestî yên azad û xwe ji qeyd û bendên kevneşopî azad dike, vê yekê derfet da wê ku bi awayekî azad û kûr derbirîna ezmûna xwe ya mirovî û çandî bike.
Di kariyera xwe ya edebî de, Eyjan ji gelek sembolên edebî bandor girtiye, wek Cegerxwîn, Melayê Cizîrî û Konê Reş, li gel Adonis û Maxût, her weha ji edebiyata Yewnanî jî sûde girtiye û bi bandor bûye, ku ev yek bû sedema berfirehkirina asoya wê ya sembolîk û rewşenbîrî û dewlemendkirina ezmûna wê ya helbestî.


Şarezayiya wê ya wêjeyî tenê bi nivîsandina helbestê re sînordar nema, lê berfireh bû ku gotar, çîrok û roman jî bigire nav xwe, li gel xebata wê ya berdewam di warê helbestê de, bi pirrengiyeke ku berfirehiya ezmûna wê ya edebî û dewlemendiya amûrên wê yên derbirînê nîşan dide.
Helbestvan Ayjan di 27’ê mijdara 2025’an de yekemîn dîwana xwe ya helbestan a bi navê “Bêhna Giyan” bi zimanê erebî çap kir, ku ev serpêhatiyek e ku tê de gihîştina hestyarî û dîtinek helbestî ya taybetî nîşan dide, her wiha berhemeke wê ya din a bi navê “Dema Kevir Dipeyive” jî bi zimanê Erebî hatiye çapkirin, lê ji ber şert û mercên ku herêm têre derbas bûye, heta niha nehatiye weşandin.

Her wiha pênc destnivîsên wê yên helbestî hene ku di navbera zimanên erebî, Kurdî û romanê de belav bûne, dîwanên wê yên bi zimanê erebî evin:
1- Cixara min.
2- Kurdistan bi xîmava çiya.
3-Romana “Xwişka Mezin”.
Yên bi Kurdî nivîsandîn jî evin:
1-Dara berû
2- Li xwe bigere

Di cihêrengiyeke ku dewlemendiya serpêhatiya wê û pirbûna asoyên wê yên afirîner nîşan dide.

Di nav helbestên wê yên herî navdar ên bi zimanê Erebî ev in:
1- Bîranînke ku nayê jêbirin.
2- Êşa vegerê.
3- Bermayiyên evînê.
Her wiha yên bi zimanê Kurdî jî evin:
1- Eşqa îlahî
2- Destê te
Di nivîsên wê de mijarên bîranîn, hesret û xweparêzî bi kûrahiyeke mirovî ya zelal têne nîşandan, ku ezmûna wê ya edebî bi rengekî hestyarî û taybet diyar dike.
Helbestên wê tenê di rûpelan de sînordar neman, lê derbasî wargehên berfireh bûne, ku li wir hin nivîsên wê bi teknîkên nûjen hatine veguherandin bo berhemên stranbêjiyê, wek “Dîroka Kurd”, “Mela Mistefa Barzanî” û “Ez im Kurdistanim”.

Ev hewldan ji bo berfirehkirina helbestê ber bi qadê dengî ve û gihandina wê ji raya giştî re bi ruhê nûjen hatiye kirin.



Ji hêla kesayetî ve, ew zewiciye û dayika pênc zarokan e: (Ayînda, Binaz, Mîran, Oumîd û Ibrahim) û dayîkbûn beşeke sereke ya ezmûna wê ya mirovî û afirînerî pêk tîne, wê di nivîsarên xwe de hêstek kûrtir zêde kir, ku di hestiyariya nivîsarên wê û rastiya vegotina wê de xuya dibû.
Helbestvan Eyjan qet tucarî ji çalakiyên çandî û wêjeyî yên girêdayî bi doza gelê xwe dûr nebûye, ji ber ku di gelek ji van helkeft û çalakiyan de xwedî hebûnek çalak û bi bandor bû.
Ew endama Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistan e û di gelek şevbihêrkên helbestî de beşdar bûye, wek yên Berzîn û Binislawê di sala 2013an de (Hewlêr), ji bilî beşdarbûna wê di Roja Helbesta Kurdî, Pêşangeha Pirtûkan a Hrerkolê li Qamişlo di sala 2026’an de û 11mîn Festîvala Rojava ya Çand û Hunerê.
Her weha hebûnek wê ya ragihandinî jî hebû, bi riya Radyoya Arta û Kanalê War TV di çarçoveya bernameya “Axwar” de, ji bilî xebata berdewam li ser platformên medyaya civakî.
Wê bawernameya rêzgirtinê ji aliyê (Liqê 16ê li Binislawê – Herêma Kurdistanê) wergirt, rêzdarî ji kar û xebatên wê yên wêjeyî re.

Helbestvan Ayjan bi bedewiya tîpên xwe û bi rewanbêjiya wateyên xwe tê cudakirin, lewra peyvên wê bi nermî û dilpakî diherikin dilan, birînan derman dikin û rihetî û aramiyê didin giyan.

Ew niha di lûtkeya dan û afirîneriya xwe de ye, bê sek û westan nivîsandinê bi hewes û biryardariyeke mezin didomîne, tevî şert û mercên dijwar û zehmetiyên ku pê re derbas bûne, da ku peyvên wê nîşana pêdarî û bedewiya mirovahiyê di heman demê de bimîne.
Hêviyên min ji bo wê serkeftin û ronahiyek zêdetir di rêça wê ya afirînerî de.

# Kirîza aborî û xizmetguzarî li Dêrazorê kûrtir dibe

**Piştî kontrolkirina bajarê Dêrazorê ji hêla hikumeta demkî ya Sûriyê ve, astengî û aloziyên aborî her ku diçe zêde dibin. Di heman demê de ji ber kêmbûna derfetên kar, asta bêkarî û xizaniyê bilind dibe û xizmetguzariyên bingehîn jî bi giştî tên hilweşandin.**

**Lîloz Hisên**

Li bajarê Dêrazorê di rewşeke aborî ya kur û tevlihev dijî, herwiha aloziyên wekî bêkarî, bilindbûna lêçûna jiyanî û hilwişîna xizmetguzariyên bingehîn ketine nava hev de, digel nehevsengiyên di avahîsaziya bazara kar de û qelsbûna tevgera aboriya giştî. Ev rewş bi awayekî berbiçav zêde bû piştî derketina Hêzên Sûriya Demokratîk ji bajêr û kontrolkirina wê ji hêla hikumeta Sûriyê ya demkî ve. Li gorî malperên medyayê ku ji şêniyên wan deveran girtine hatiye destnîşankirin ku bi awayekî zelal asta xizmetguzariyê û hilwişîna şiyana jiyanî bi paş vegeriyaye, ligel bilindbûna buhayên û kêmbûnên madeyên bingehîn ku rewşa aborî li ser şêniyan wekî zexteke mezin çîkiriye.

Ev faktor bi giştî bûne sedema ku kirîzeke aborî ya mezin derkeve holê, ku bi awayekî rasterast bandor li ser jiyan û arsta jiyanî ya şêniyan nîşan dide, di çarçoveya nebûna çareseriyan û nebersivdayîneke guncav ji bo van zehmetiyên heyî.

### Bazara kar… bêkariya bilind û nehevsengiya di mekanîzmayên kar de

Bazara kar li Dêrazorê ji sektorên herî ku bi rewşa heyî bandor bûye. Bajêr ji rêjeyên bilind ê bêkariyê êşê dikşîne bi taybet di nava kategoriya ciwanan û derçûnên zanîngehan de. Ev mijar ne tenê di kêmbûna derfetan de sînorkirî ye, lê gihaştiye wekî ku li gorî şêniyan tê wesifandin “nebûna edaletê” di teyînkirina karmendiyê de.

Şahidiyên herêmî nîşan didin ku geleke teyînkirinên ji bo kar, heta yên ku bi fermî hatine raghandine, ne li gorî pîvanên karîgeriyê an jêhatiyan têne bijartin, lê heta astekê waste an jî têkiliyên eşîrtî roleke giring di pejirandina diyarkirina kesên tên qebûlkirin. Ev rastî hiştiye ku hejmareke mezin ji karîgeriyên zanistî bêne paşguhkirin herwiha valahiyekê di navbera perwerde û bazara kar de çêbike.



### Xizanî û kêmbûna hêza kirînê li Dêrazorê

Li gel bilindbûna rêjeyên xizaniyê, kêmbûna hêza kirînê ya şêniyan, ku ji ber kêmbûna çalakiyên aborî û kêmbûna derfetên kar, dirêj dibe. Ev yek bi nebûna projeyên pêşketinê yên bi bandor û veberhênana qels ve girêdayî ye, ku bûye sedema bêkarîya berfireh, di heman demê de neçar dike ku beşek mezin ji gel xwe bispêre karên nearam û demkî ku dahatiyek têr an domdar peyda nake.

Rewş ji ber wasteyên berbelav û nebûna dadperweriyê di teyînkirina di kar de hîn xirabtir dibe, ku gelek kesên jêhatî ji derfetên kar bêpar dihêle û nerazîbûna civakî zêde dike. Ev rewş hiştiye ku gelek şêniyên herêmê xwe bispêrin alîkariyêm mirovî, ku ev alîkarî jî bi awayekî dadperwer nayê belavkirin, nemaze ji ber erdnîgaiya bajêr a dûr.

### Kirîza nan…nîşaneya lawazbûna ewlehiya xurekê ye

Krîza nan li Dêrazorê mînakek eşkere ye ku xirabûna rewşa ewlehiya xwarinê li bajêr nîşan dide. Buhayên nan bi awayekî berbiçav zêde bûne, di heman demê de kalîte û rêjeya wê kêm bûye.

Li gorî agahiyên ku ji Çavdêriya Mafên Mirovan hatiye bidest xistin, buhayên her kîsek nan ji nangehên fermi yên girêdayî hikumeta demkî 3500 lîreya Sûrî ye, herwiha buhayê nanê Siyahî dighêje 5500 lîreya Sûrî, ku ev yek barekî zêde li ser şêniyan ferz dike, bi taybet ligel sînorkirina dahata gelek malbatan.

Di heman demê de welatî ji kalîteya nebaş a ardê ku tê bikaranîn û nebicîhanîna taybetmendiyên pêwîst, ji bilî kêmbûna mîqdarên pêşkêşkirî gazinan dikin, ku ew neçar in ku bi saetên dirêj li ber nangehan bisekinin bêyî ku têra xwe bistînin.



Malbat bi bijarteyên sînorkirî di navbera nanê bi kalîteya nebaş û buhayên bilind de rû bi rû dimînin, ku ev yek berpirsiyariya dabînkirina vê kelûpela bingehîn dixe ser milê rayedarên peywendîdar, di nav daxwazên ji bo baştirkirina kalîteyê, zêdekirina mîqdarê û kontrolkirina buhayan de, da ku mafê welatiyan ji bo bidestxistina nan bi awayekî baş were garantîkirin.

### Sektora enerjiyê… kirîza elktrîkê

Sektora enerjiyê yek ji mezintrîn pirsgirêkên li Dêrazorê ye, ku şêniyên wê ji qutbûnên tevahî yên elektrîkê êşê dikşînin, nemaze li deverên gundewarî. Ev qutbûn bi salan e berdewam dike, ev pirsgirêk şêniyan neçar dike ku xwe bispêrin çareseriyên alternatîf.

Di salên borî de şêniyan xwe dispartin jeneratoran ji bo dabînkirina elektrîkê, ku wekî vebijarka sereke bûn, ji ber ku ji mazota piştgirî ya ku heftane dihat belavkirin sûd digirtin, tevî sînorkirina van çareseriyan lê heta astekê şêniyan karên xwe pê diqedandin. Lê niha bi guhertina serweriya herêmê digel rawestandina piştgiriyê û hilwişîna binesaziya toreyên elktrîkê di heman demê de diyarkirina buhayên mazota xizmetê ji hêla aliyên peywendîdar di hikumeta demkî, pêk hat. Di encamê de buhayê lîtreyek mazotê ji 10 hezaran lîreyan derbas bû, ji ber vê yekê xebitandina jeneratorê pir biha bû.

Ji bo sîstemên enerjiya rojê, tevî karanîna wan a berfireh jî, ew çareseriyek berfireh peyda nakin, ji ber lêçûnên wan ên bilind û kapasîteya hilberînê ya sînorkirî, nemaze di şert û mercên hewayê yên ne guncaw de.

Ev yek rasterast di bilindbûna buhayê nan, lêçûnên veguhastinê, berhemên çandiniyê de û rawestandina piraniya jeneratorên ku elektrîkê ji bo taxan dabîn dikirin, hat nîşan dan.

### Sotemenî… bilindbûna buhayan û nehevsengiya bazarê

Dêrazorê ji ber krîza kêmbûna sotemeniyê, bilindbûna buhayan û kêmbûna berhemên bingehîn ên petrolê (mazot, benzîn, gaz) nerazîbûneke zêde ya gel nîşan dide, ku bandoreke mezin li ser jiyana rojane ya şêniyan û xizmetên bingehîn ên wekî germkirin, veguhastin û çandiniyê kiriye, di nava daxwazên gel de ji bo dîtina çareseriyên bilez û domdar.

Buhayê sotemeniyê li Dêrazorê bi awayekî berbiçav zêde bûye, di demek kurt de du qat zêde bûye. Buhayê mazotê gihaştiye nêzîkî 9 hezar û 400 lîreyên Sûrî û yê benzînê jî gihaştiye zêdetirî 10 hezar û 700 lîreyên Sûrî, ku ev yek bûye sedema zêdebûna lêçûnên veguhastin û hilberînê.

Ev zêdebûn bi çend faktoran ve girêdayî ye, di nav wan de kêmbûna dabînkirinê û binesaziya qels, di heman demê de biryara qedexekirina heraqatên kevin ku alternatîfên erzantir pêşkêş dikir, tevî zirara wan a ku dighaşt jîngehê. Ev zêdebûn ji aliyê geleke malbatên herêmê ve rastî nerazîbûneke mezin hat, ji ber ku buhayên bilind barekî din li ser wan zêde dike, herwiha bi sedan ji gelên herêmê ji derfetên kar ku heraqatên kevin ji wan re peyda dikirin, bêpar dike. Gel didîtin ku rewş ew ê piştî ku zeveiyên petrolê vegerin bin kontrola dewletê baş bibe, berhemên petrolê dê peyda bibe û buhayê wê kêm bibe, ne berovajî.

Herwiha ev yek bû sedema ku gelek karkerên di vê sektorê de çavkaniyên dahata xwe winda bikin, ku ev yek rêjeyên bêkariyê zêde kir û bandorek neyînî li aboriya herêmî kir.

### Nirxandinên di navbera jîngehê û aborî de

Krîza heraqatên petrolê yên kevin balê dikşîne li ser zehemtiya hevsengiya parastina jîngehê bi îstîqrara aborî re nîşan dide. Her çend van heraqatan kar û berhemên petrolê yên erzan peyda dikirin jî, lê di heman demê de bûn sedema qirêjiyek xeternak, ku bû sedema derketina zirarên mezin ên tenduristî û jîngehê.

Hin pispor dibînin ku çareserî ne di vegera van pratîkan de ye, lê belê di dîtina alternatîfên domdar de ye, wekî avakirina yekîneyên rafineriyê yên piçûk ku li gorî pîvanên jîngehê dixebitin û peydakirina derfetên kar ên alternatîf ji bo karkerên bandordar.

Rewşa aborî ya li Dêrazorê komek ji pirsgirêkên aloz nîşan dide ku destwerdana lezgîn û stratejiyên demdirêj hewce dike. Tevî çavkaniyên xwezayî yên zêde, herêm ji rêveberî û veberhênana qels êşê dikişîne, ku ev yek krîzên wê girantir kiriye.

Ji bo vejîna aborî li Dêrazorê, nêzîkatiyek berfireh hewce dike ku reformên aborî, başkirina xizmetguzariyan û piştgiriya ji bo însyatîfên herêmî di nav xwe de bigire, da ku pêşketinek domdar a ku sûdê dide şêniyan misoger bike.

Di çarçoveya rewşa heyî, paşeroja bajêr hîn jî girêdayî şiyana rayedarên peywendîdar e ku bersiva van pirsgirêkan bidin û wan veguherînin derfetên pêşketin û ji nû ve avakirinê.



# Îrana nû: Tirkiyê

**Volqan Elî**

Komara Tirkiyê di destpêka xwe de di salên 1919-1922’an de ji aliyê gelê Kurd û Tirk ve di serî de ji aliyê hêzên Misilman, gelên curbicur ên Anatoliyê ve hatibû avakirin. Ji lewra îhtimal hebû ku ta di wê serdemê de di serî de Anatolî, Kurdistan û her ku diçe tevahiya Rojhilata Navîn ji bo gel û civakan bibe bexçeyê azadî û bihevre jiyanê. Lê belê împaratoriya Brîtanî ku ji xwe re digot ‘împaratoriya ku Roj li ser naçe ava’ (ji ber ku bigire ji cezîreyeke herî biçûk a Ewrûpa heta bi parzemîna Awûstralyayê her der kiribû ya xwe –ji aliyê aborî ve pêve girêdayî bû-) ev rewş ji bo xwe bi xeter nirxand. Hikumeta M. Kemal dorpêç kir, bê tesîr kir: berda pêsîra Kurd û hêzên serhildêr ku li dijî dagirkeriya Ewrûpî têkoşîn meşandibûn. Di encamê de Komara Tirkiyê, bi makezagona 1924’an her ku çûyî bi Peymana Enqereyê (1926) wekî Îsraîlek pêşwext a li ser erdên Anatolî û Kurdistanê da avakirin. Di vê de berjewendiya duyemîn a Brîtanyayê ew bû ku Îraq û Başûrê Kurdistanê jê re dima. Yanî eger dewleta nû ya Tirkiyê ji gotinên xwe yên ‘Misaqî Milli’ (Anatolî û Bakurê Kurdistanê ne têde) dest berdana, dikarîbû hebûna xwe bidomanda.

Li ser vê bingehê dewleta Tirk di wan serdeman de bi dehan gel û bawerî li ser erdên Anatolî û Bakurê Kurdistanê bişaftin, asîmîle kirin û hin jî wekî Kurd, Ermen di jenosîdê re derbas kirin. Dibe ku nijadkujiya li ser Ermen, Kurd û qewmên curbicur ji aliyê fîzîkî ve bi piranî di serdema împaratoriya Osmanî de pêkhatibe, lê ew bi xwe, xwe wekî mîrasxwûrê vê împaratoriyê dibîne û ya din jî piştî ku peymana di navbera gelên Anatolî û Kurdistanê de têk diçe ruhê İttihat ve Teraki yê qirker dibe îdeolojiya dewleta Tirk. Li ser vê bingehê wezîrekî (Mahmut Esat Bozkurt) dewleta Tirk ê wê serdemê dibêje; “Li Tirkiyê heqê ti millet-qewmên din tine ku tiştekî bibêje; tenê heqekî wan heye, dikarin xizmeta milletê Tirk bikin”. Ev ne tenê bi gotinê maye, di jiyanê de jî bi zilm û zordariya li ser gel û baweriyan piştrast bûye: ji lewra îro li welatê ku jêre Tirkiye dibêjin, ji derveyê qewmê Tirk û ji derveyê Misilmantiya Henefî yan î Şafî pejna ti rengên din nayê.

Vaye bi saya vê mîrasê dewleta Tirk (tinekirina gel û baweriyên li herêmê) di serdema şerê cîhanê yê duyemîn de piştî ku şer bi şiklekî çareser bû, sala 1948’an encax karîbû Îsraîla modern-hemdem ava bibe. Jixwe qraltiya Brîtanyayê, avabûna vê dewletê di serdema şerê cîhanê yê yekemîn de soz dabû Yahûdiyên li cîhanê. Lê belê komplogeriya îngîlîzî ji bo ku vê planê pêkbîne, wekî gava vê ya destpêkê îhtimala pêkhatina Komara Demokratîk a Tirkiyeyê têkbiribû (piştî 1924’an ji nû ve avakirina dewleta Tirk). Ji ber vê rewşê çawa ku Îsraîla rastîn ava bû, di nav dewletên ku xwe Misilman dihesibînin de destpêkê ya ku hebûna wê qebûl kir, bû dagirkeriya Tirk. Di maneyekê de dewleta dagirker a Tirk, deynê li ser xwe vedigerand komplogeriya Îngîlîzî. Çawa ku bi Kurdî dibêjin ‘Nû hatin kevin xelat in’ dema Îsraîl ava bû ya derewîn (dagirkeriya Tirk) bû xelata hêzên hegemon ên wê serdemê. Dewleta Tirk diviyabû ku xwe ji nû ve îspat bike da ku karibe hebûna xwe bidomîne. Lewra wezîfeya xwe pêkanîbû, Îsraîla rastîn li ser mîrasê wê yê madî û manewî ava bibû. wekî serdemên berê, pêwîstî bi wê nemabû.

Dagirkeriya Tirk rabû çikir? Ji bo ku xwe îsbat bike, ew xizmetkara hêzên hegemon e, artêşa xwe şand şerê Koreyê. Piştî vê, ji ber nîşandana sedaqeta xwe karîbû bikeve NATO’yê. Yanî kurê kêrnehatî yê bavê xwe, li malbavê xwe vegerî.

Sal 1952, di serdema hikumeta Adnan Menderes a Partiya Demokrat de ev dewleta navbirî, karîbû bikeve binê baskê hêzên serdemê yên hegemonîk. Piştî vê dîrokê, hêzên hakim li cîhanê, ji ber hebûna sosyalîzma pêkhatî û Sowyet Rûsyayê ew bi neyînî bi du erkan wezîfedar kirin: yek ew ê bibe navenda Îslama siyasî. Ya duyemîm ew ê ji bo herêmê li Rojhilata Navîn bibe astengek li ber Rûsya.

Dewleta dagirker a Tirk ev wezîfeya xwe ya nû heta bi salên 1990’î bi serbilindî û bi serkeftî pêkanî. Ji bo vê yekê ji ti fedekariyan xwe neda aliyekî (!?); wezîr û serokwezîrên xwe îdam kirin û herî dawî jî serokkomarê xwe Ozal da qetlkirin. Bi sedan pêşengên ciwanên şoreşger di êşkence û pevçûnan de şehîd xist. Hemû keftûlefta wê ji bo xizmeta komplogeriya hêzên hegemonîk ên cîhanî bû. Ta ku di destpêka salên 1990’î de Sovyet Rûsya hilweşiya û sosyalîzma pêkhatî wekî pergal şahitî…

Piştî vê dîrokê (jixwe bi avabûna Îsraîla rastîn hema piştî şerê cîhanê yê duyemîn) ji ber ku sedemen hebûna dewleta Tirk li holê neman, bi rastî jî hêzên hegemon ên kapîtalîst-emperyalîst wezîfeyeke demkî dabûn dewleta Tirk: Zindîkirina Îslama radîkal…

Dewleta dagirker a Tirk di bin fermandariya Tayip Erdoğan de ev wezîfe jî bi serkeftî pêkanî! Vê dewletê çendîn rêxistinên wekî DAIŞ’ê finanse kir û berda canê mirovahiya cîhanê. Hê jî ev rewş berdewam e. Emşat, Sultan Murat, hêzên Nureddin Zengi ûhwd ku hê îro jî di lîsta terorê yê cîhanê de ne, ma destnîşanî çi dikin!

Dewleta Tirk bi vê taybetmendiya xwe herî zêde ji bo Îsraîlê xeter e: ji ber vê sedemê herî dawî Îsraîlê bi wezîfeyeke nû, dewleta dagirker erkdar kir: Îrana Nû!

Her hal Elî Xemeneyîtî jî dê bibe para Tayip Erdogan!

# Gelo lihevkirin bi zihniyetek ku azadiya jinan red dike mimkun e?

**Hasan Ağaç**

Ji nû ve şekildana dînamîkên hêzê li Rojhilata Navîn ne tenê guhertina sînoran, hevpeymanan û avahiyên hêzê ye, lê di heman demê de têkoşînek kûr li ser modela civakî ya ku dê ser bikeve eşkere dike. Yek ji aliyên herî krîtîk ên vê têkoşînê niha li dora YPJ’ê ye. Ev nîqaş, ku li ser rûyê erdê wekî mijarek entegrasyona leşkerî xuya dike, di rastiyê de nîşan dide nakokiyek pir kûrtir e. Ji ber vê yekê, divê pirsa yekem bi zelalî û bê guman were pirsîn: Çima YPJ nayê qebûlkirin?

Bersiva vê pirsê ne tenê pêşeroja avahiyek leşkerî, lê di heman demê de cihê jinan li Rojhilata Navîn jî diyar dike. Ji ber ku YPJ ne hêzek leşkerî ya asayî ye. YPJ nunertiya jinan e ku pasîfbûna ku bi dîrokî li ser wan hatiye ferzkirin red dikin û dibe mijara gotinê. Rola wê di şerê li dijî DAIŞê de ne tenê serkeftinek leşkerî ye, lê di heman demê de veguherîna jinan ji “hebûnên ku werin parastin” bo “îradeyek ku xwe diparêze” ye. Di vî warî de, YPJ ne hêzek ewlehiyê ye, lê şikestinek di zîhniyetê de ye. Ji ber vê yekê çima hêzek wisa di nav pergalê de nayê xwestin? Bersiva vê pirsê di karakterê rêveberiya demkî de ye ku li Şamê çêbûye. Ev avahî di xeta El-Nusra de kok digire, xwedî rabirdûyek cîhadîst e û li ser zîhniyetek ku ji hêla mêran ve serdest e hatiye avakirin. Dibe ku nav guherîbin, dibe ku hevpeyman ji hev cuda bibin; lêbelê, ne mimkûn e ku zîhniyet ewqas zû biguhere. Ji ber vê yekê, pirsgirêk ne tenê hilbijartinek siyasî ye, lê nakokiyek avahîsaziyê ye. Ma gengaz e ku têgihîştinek ku azadiya jinan dide pêşîniyê bi zîhniyetek ku jinan sînordar dike, kontrol dike û marjînalîze dike re bijî? Nîqaşa YPJ tam xuyangiya berbiçav a vê pirsê ye. Ji ber ku qebûlkirina YPJ tê wateya qebûlkirina ne tenê nunertiya jinan, lê di heman demê de îrade û hêza wan bi xwe ye jî. Ev diafirîne qutbûnek ku ji bo pergala ku ji hêla mêran ve serdest e dijwar e ku qebûl bike. Îro, pêşniyarên ku YPJ’ê kêm bikin hêzek polîsî ne artêşek nîşanek eşkere ya vê nêzîkatiyê ne. Ev pêşniyar ne li ser entegrekirina YPJ’ê di nav pergalê de ye, lê li ser bêbandorkirin û veguherîna wê ye. Esasê vê nêzîkatiyê ev e: Jin dikarin li wir bin, lê di nav sînorên diyarkirî de. Jin dikarin beşdar bibin, lê bê hêz. Lê belê, YPJ tam bi şikandina van sînoran derket holê. Di vê nuqteyê de, divê em pirsek kûrtir bipirsin: Redkirina YPJ tê çi wateyê? Bersiv eşkere ye. Redkirina YPJ tê wateya redkirina rizgariya jinan. Redkirina rizgariya jinan tê wateya redkirina paradîgmaya rizgariya jinan a ku ji hêla Rêber Apo ve hatî pêşxistin. Ji ber ku ev paradîgma jinan ne tenê wekî takekesên wekhev, lê di heman demê de wekî hêza damezrîner a jiyanek azad jî dibîne. Ew nîşan dide ku civakek ku jin tê de azad nebin nikare azad be. Li Rojava, ev têgihîştin tenê wekî gotarek teorîk nemaye, lê di pratîkê de jî hatiye bicîh kirin. Ew bi rêya pergala hevserokatiyê, rêxistinên jinan û YPJ’ê ve bûye modelek civakî ya berbiçav. Ji ber vê yekê, nîqaşa YPJ ne mijara entegrasyona leşkerî ya teknîkî ye. Ev nîqaş rûbirûbûnek di navbera du cîhanên cûda de ye. Li aliyekî, modelek civakî ya li ser bingeha rizgariya jinan; li aliyê din, pergalek ku ji hêla mêran ve serdest e, navendî û kontrolker e. Nekarîna van her du nêzîkatiyan ji bo lihevhatinê ne qelsiyek e, lê belê nîşanek rastiyê ye. Ji ber ku mesele li vir ne li ser adaptasyonê ye, lê li ser rêwerzê ye. Yan pergaleke nû li ser bingeha rizgariya jinan dê were damezrandin, yan jî sîstema heyî dê bi parastina sînorên xwe hebûna xwe bidomîne.

Rastiya ku jin îro li Qamîşloyê derketin kolanan û gotin “Em hemû YPJ ne” îfadeya herî zelal a vê rastiyê ye. Ev slogan ne girêdaneke hestyarî ye, lê hişmendiyeke civakî ye. YPJ êdî ne tenê avahiyeke leşkerî ye, lê bûye nirxeke civakî, xeta azadiyê. Ji ber vê yekê, hilweşandin an kêmkirina YPJ’ê ne tenê paşveçûna avahiyek, lê di heman demê de tê wateya paşveçûna destkeftiyeke civakî jî. Pêvajoya veguherînê li Rojhilata Navîn, her çend derfetên nû ji bo gelek hêzan dihewîne jî, xetereyên mezin jî dihewîne. Di vê pêvajoyê de, cihê jinan di nav pergalê de dê diyarker be. Gelo modelek ku jin tê de mijar in dê pêş bikeve, an jî pergalên kevin, ku jin careke din têne sînordarkirin, dê xwe ji nû ve hilberînin?

Di encamê de, meseleya YPJ’ê ne tiştek e ku bi rêkeftinên teknîkî were paşxistin an çareserkirin. Ev mesele rasterast meseleyeke zîhniyetê ye. Ji ber vê yekê, çareseriya wê tenê di vê astê de mimkun e. YPJ ne tenê hêzek leşkerî ye. YPJ xetek e. Û ev xet rastiyek ewqas kûr temsîl dike ku dê pêşeroja Rojhilata Navîn diyar bike.

# ‘Stratejiya dewletê xapînok e û pêwîst e partiyên siyasî li Tirkiyê bi erkên xwe rabin’

Parlementera Sêrtê ya DEM Partî Sabahat Saritaş da zanîn ku Rêber Apo heta niha ji para xwe zêdetir kiriye û divê dewlet ji vê yekê haydar be. Ramana stratejîk a dewletê taktîkek xapînok bikar tîne ku hindik dide lê pir qezenc dike. Herwiha ne tenê Partiya DEM, lê her partiyek siyasî li Tirkiyê pêwîst e bi erka xwe rabe, ji ber ku ev pêvajo di çarçoveya xwe ya civakî û dîrokî de ji her cure siyasetê mezintir e.

**Esma Mistefa**

Girîdayî pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê, Parlementera Sêrtê ya DEM Partî’yê Sabahat Erdoğan Saritaş, bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**1- Hûn pêşveçûnên Pêvajoya Aştiyê û bi taybet di milê zagonî de çawa dinirxînin?**

Bi rastî, nêrîna hikumetê ya vê pêvajoyê û ya me ji hev cuda ye. Li gorî wan pêvajo dimeşe, dibe ku ev geşedanên heyî li gor dilê wan be lê belê ji ber tevgerên deshilatê ya heta dema niha, rewş ji bo me bi heman awayî xuya nake. Em bi awayekî cuda lê dinêrin û bi awayekî cuda şîrove dikin. Em li meseleyê tenê wek şewitandina çekan nanêrin. Şewitandina çekan ji bo azadî û çareseriyê gaveke girîng bû. Daxwaz û hewladana me ya ji bo avakirina civakeke demokratîk heye. Em li pey aştiya civakî, demokrasî û jiyaneke azad in. Ji ber vê yekê jî nêrîna me ya hikumetê ji hev cuda ye.

Bê guman, aliyê qanûnî yê pêvajoyê mijara herî krîtîk e. Ji ber ku avêtina gavên din bi piranî bi vê yekê ve girêdayî ye. Heta ku di vî warî de gav neyên avêtin, ew kesên ku çekên xwe deynin nikarin tevlî civakê bibin, pirsgirêka zindanan çareser nabe û mafên wekî rêveberiya herêmî, perwerdehiya bi zimanê dayikê û garantiyên di derbarê çandê de nayên bicihanîn. Ji ber vê yekê, gava herî lezgîn ku divê di vê qonaxê de were avêtin, avêtina gavên qanûnî ye.

**2-Di Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de dewleta Tirk hincetên cur bi cur derdixîne û derngmayîn çêbûye, armanca dewleta Tirk ji vê yekê çi ye?**

Çawa ku destpêka pêvajoyê ne tenê li ser mijarên navxweyî bû, pêşveçûna wê jî bi heman rengî ne, tenê bi mijarên navxweyî ve sînordar e. Ji ber vê yekê, ramana stratejîk a dewletê xwe bi hişmendiya ku pêşketinên li Rojhilata Navîn bi vê pêvajoyê ve girêdayî ne, bi cih dike. Bi gotineke din, ramana stratejîk a dewletê taktîkek xapînok bikar tîne ku hindik dide lê pir qezenc dike. Ew pêvajoyê an lez dike an jî hêdî dike, paralel bi pêşketinên li Sûriye, Iraq û Îranê re. Bê guman, aliyê siyasî yê navxweyî jî heye. Bi taybetî partiya desthilatdar hewl dide ku bingeha xwe bide wê encamê ku ew hîn jî kontrolê diparêze. Ev bi parastina bingeha xwe ji bo planên demkurt û li ser hilbijartinan disekine ve girêdayî ye.

Dewlet, bi taybetî bi rêya nêzîkatiya xwe ya “teyît-tespît”, hewl dide ku ji bo xwe qadeke ewle biafirîne. Bi vî rengî, ew dixwaze piştrast be ku PKK êdî “gef”ek rastîn an fîzîkî nîne. Bê guman, wekî ku we di pirsa xwe de behs kir, ev hemî tenê hincet e. Rêber Abdullah Ocalan hewl dide ku pirsgirêkek sedsalî ku ev 50’î sal in bi tundiyê ve girêdayî ye, bi ciddiyeteke mezin û berpirsiyariyeke dîrokî çareser bike û bi vê hesasiyetê nêzîkî wê dibe. Bi rastî jî ew ji dewletê heman astê nêzîkatiyê hêvî dike. Rêber Abdullah Ocalan heta niha ji para xwe zêdetir kiriye û divê dewlet ji vê yekê haydar be.

**3-Ji bo pêşveçûna pêvajoyê çi partiyên Tirkiyê û bi taybet DEM partî tê xwestin?**

Bi salan e dewlet ji PKKê re dibêje, “Heke hûn çareseriyek dixwazin, ji çiyayan dakevin û li deştan siyasetê bikin.” Ew roj di dawiyê de hat. PKK’ê çekên xwe danîne û niha li benda gavên qanûnî yên pêwîst e ku werin avêtin da ku şert û mercên ji bo çalakiya siyasî ya berfireh - ango ji bo “siyaseta li deştan” biafirînin. Lêbelê, heta niha, di vî warî de gavek berbiçav nehatiye avêtin.

Birêz Ocalan, dema ku pêvajoyê dest pê kir, diyar kir ku serdema têkoşîna çekdarî bi dawî bûye û “divê avakirina erênî dest pê bike.” Ev tê vê wateyê ku partiyên siyasî niha di qada siyasî de rolek mezintir dilîzin. Ji ber vê yekê, ne tenê Partiya DEM, lê her partiyek siyasî ya li Tirkiyeyê erkê wê ye ku vê pêvajoyê bi awayekî rast ji civakê re rave bike, ji bo aştiya civakî bixebite, û ya herî girîng jî, Parlamentoyê ji bo vê armancê bi şev û roj bixebite. Bi vî rengî, li Parlamentoyê komîsyonek hate damezrandin, û wê hin karên girîng pêk anîn û bi dawî kirin; ev bê guman girîng e, lê têrê nake. Divê Parlamento gelek bêtir bike. Ew dikare. Wekî Partiya DEM, me ji destpêkê ve helwestek li gorî ruhê pêvajoyê girtiye. Ji zimanê me yê siyasî bigire heta xebata me, em li ser misogerkirina serkeftina vê pêvajoyê ne û em ber bi wê armancê ve diçin. Bê guman, em dizanin ku hewldanên me hîn jî têrê nakin. Berî ku em berdewam bikin, divê em bi baldarî hêviyên civakê û daxwazên gel, heta hûrguliyên herî piçûk, binirxînin.

Bi vî rengî, bi taybetî partiyên muxalefetê divê rewşê bi vî rengî bibînin û vê pêvajoyê ji bo hesabên siyasî yên demkurt qurban nekin. Ji ber ku ev pêvajo di çarçoveya xwe ya civakî û dîrokî de ji her cure siyasetê mezintir e.

**4-Pêvajo bandoreke çawa li Kurdistanê û giştî herêmê kir, derengmayîna wê, wê çi bi xwe re bîne?**

Bêguman, têgihîştina ku aştî ji şer çêtir e, bandorek pir erênî hem li Kurdistanê û hem jî li herêmê çêkiriye. Tevgera civakî û kelecana li Kurdistanê piştî banga 27’ê Sibatê eşkere ye. Vekirina kanalên siyasî yên demokratîk ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd, dibe ku pirsgirêka herî dirêj a cîhanê û niha pirsgirêkek gerdûnî ye ku bi Kurdistanê ve sînordar nîne, û nêzîkbûna aştiyê, bê guman atmosferek pir erênî di civakê de çêkiriye. Dibe ku afirandina atmosferek têrê neke; ew jî piştgiriyek girîng bi dest xistiye. Hema hema tevahiya gelê Kurd li Kurdistanê piştgirî da vê pêvajoyê û piştgiriya xwe ji bo banga 27’ê Sibatê ragihand. Me ev yek di gelek waran de dît, û ez dixwazim tekez bikim ku me di pîrozbahiyên Newrozê yên dawî de bi zelalî û bi tevahî dît. Gelê Kurd peyamek pir zelal ji dewlet, herêmê û bi eşkereyî, ji tevahiya cîhanê re şand: em aştiyê dixwazin, û em ê her tiştê ku ji bo aştiyê hewce be bikin. Em amade ne ku her bedelê ku me di şer de ji bo aştiyê daye bidin. Ji ber vê yekê, tevahiya cîhanê niha dît ku gelê Kurd ji bo aştiyê amade ye ku ew ji bo qada siyasî ya demokratîk amade ye.

Lêbelê, wekî ku me ji destpêkê ve diyar kir, têkbirina pêvajoyê û neavêtina gavên qanûnî bê guman dibe sedema atmosferek bêhêvîtiyê di civakê de. Ev ji ber ku dema aliyek gav bavêje dema ku aliyê din tenê li bendê ye û qet gav navêje - û ev alî dewlet e - bê guman di civakê de atmosferek bêhêvîtiyê diafirîne, têgihîştinek ku dewlet me dixapîne. Ji ber vê yekê, piştgiriya giştî di rewşên weha de pir girîng e, wekî ku di hemî mînakên çareserkirina nakokiyan de li çaraliyê cîhanê tê dîtin. Divê êdî dewlet gavên şênber biavêje da ku hêvîya azadî û civaka demokratîk qut nebe.

**5-Di aliyê Jin de, di vê çarçoveyê de çi xebat hate kirin û çi li ser milê hemû tevgerên jin e?**

Dema ku Rêber Abdullah Ocalan pêvajoyê da destpêkirin û di peyamên xwe yên piştre de, wî bi berdewamî rola jinan tekez kir, û dema ku pêvajoyê da destpêkirin, bi berdewamî baweriya xwe bi wan anî ziman. Ev daxuyaniya Birêz Ocalan bê guman ne nêzîkatiyek hêsan e; ew berdewamiya paradîgmaya rizgariya jinan e ku wî bi salan e pêşxistiye.

Di peyamên xwe yên ji bo jinan di tevahiya pêvajoyê de, Rêber Apo azadiya jinan xiste pêşiya çareseriyê, û diyar kir ku pêvajoya komunal a demokratîk dê bi “civakbûna jina dayik” were nûvekirin. Diyar kir ku jin divê bibin pêşengên guhertina civakî û paradîgmaya modernîteya demokratîk, jin di navenda jiyan û çareseriyên demokratîk de bin, û ew bi paradîgmaya “Jin, Jiyan, Azadî” hêza bingehîn a pêvajoyê ne.

Wekî jin, em di vê wateyê de ji berpirsiyariya xwe û barê li ser milên xwe haydar in, û em bi vê hişmendiyê tevdigerin. Me ev di pîrozbahiyên 8’ê Adarê û Cejna Newrozê de ragihand. Bê guman, divê ev hişmendî beramberê pratîkî jî hebe; ji ber vê yekê em têdikoşin.

Herî dawî, di pêşengtiya TJA de, me ji bo şert û mercên Birêz Ocalan meşek ber bi Gemlikê ve li dar xist. Li wir, me careke din nêrînên xwe anîn ziman, îradeya xwe ya ji bo çareseriyek demokratîk nîşan dan û hêviya aştiyê xurt kirin.

Bi kurtasî, Birêz Ocalan, muzakeravanê sereke, bêyî ku şert û mercên azadiya jiyan û ragihandinê peyda bike, xebata xwe ya ji bo çareseriyek demokratîk, wekhev û azadîxwaz ji bo pirsgirêka Kurd û avakirina aştiyeke mayînde didomîne. Ne mimkûn e ku pêvajoyek di bin van şert û mercan de were meşandin pêş bikeve û bi ser bikeve. Li ser bingeha îradeya gelê Kurd û têkoşîna wan a dîrokî, nayê înkarkirin ku Birêz Ocalan muxatab û muzakerevanê sereke yê pêvajoyê ye. Divê ev rastî bi rêya rêziknameyên qanûnî were misogerkirin; divê statuya siyasî ya Birêz Ocalan di zûtirîn dem de were destnîşankirin û divê şert û merc ji bo ku ew bi azadî bijî û bixebite werin afirandin.



**Dilyar Cizîrî**

## Partiyên siyasî yekîtiya civakê binpê dikin!

Konfransa Yekrêzî û Yekhelwestiya Kurdî di 26’ê Nîsana 2025’an de li Qamişlo hate lidarxistin. Rast pêwistiya gelê kurd li Rojava bi yekhelwestiyê heye. Nûnerên hemû partiyên parçeyên din ên Kurdistanê jî beşdarî Konfransê bûn, ên nikarî beşdar bibe peyam şand.

Niha salek di ser konfransê re derbas bû. Her kes mereq dike ji wê rojê ve partiyên siyasî yên kurd çi kirin. Bi taybet di vê salê de êrişên dijwar li dijî Rojava hebûn. Komployek navdewletî ya gelek alî cihê xwe tê de digrin li dijî kurdên Rojava hate meşandin. Dewleta Tirk, HTŞ’ê û komên din ên çete di bin navê Artêşsa Sûriyê de êrişî Rêveberiya Xweser kirin. Ev ji Helebê destpê kir. Gelê kurd ne tenê li Rojava li her çar aliyan û derve bi yek destî li dijî êrişan rabûn ser piyan. Sedema sereke ya rawestandina êrişên çekdarî yên li ser Rojava hevgirtina gelê kurd û yekîtiya helwestê bû. Niha û tevî peyman 29’ê Çile hatiye imzekirin û behsa entegrasyonê tê kirin, êriş bi gelek rê û rêbazan dewam dike. Hin partiyên siyasî yên kurd li Rojava ku maşele hejmara wan ji moriyên moristaneikê zêdetir bûye. Li şûna rola Konfransê pêş bixin û li dijî êrişan yekîtiya xwe ya netewî hîn bi hêztir bikin. Bêyî wê hevgirtina civakî û parastina wê derxin pêş, biryarên konfransa Yekrêzî û Yekhelwestiya Kurdî paş guh kirin. Xwestin li Şamê ji bo hin kursiyan bi navê gelê kurd, nêçîrê bikin.

Di vê dema em pêşwaziya salvegera yekem a Konfransa Yekrêzî û Yekhelwestiya Kurdî dikin, êrişê û gefên li dijî Rojava bi hemû rê û rêbazan dewam dike. Niha gef û dorpêça li ser Kobanê bi hemû hêza xwe dewam dike. Ji ber wê jî, ji her demê zêdetir ji partiyên me yên siyasî tê xwestin li dijî êriş û nijatperestiya hikûmeta demkî ya Sûriyê û siyasetên dewleta Tirk biryarek hevbeş saz bikin.

Dema partiyên me yekîtiya civakî ya ji xwe heye, biparêzin dê tu alî nikaribin îradeya civaka kurd binpê bikin. Dibe hin kes vê gotina min a yekîtiya civakî ya kurd red bike û bêje civaka kurd ne yeke û di nava xwe de parçeye. Ew raste nerîn û bîrdoziyên cûda hene. Ema ev rewşa di hemû gelên cîhanê de heye. Divê civaka kurd xwedî nerîn, bîrdozî û firkên cûda be. Ew dewlemendî û pêşketine. Divê em hemû wekî hev nefikirin. Ema di mijarên netewî yên bi çarenûsa gelê me ve girêdayî ye, em yek bin. Me beriya niha jî mînaka xwedîderketina Kurdistanî ya li şoreşa Rojava anî ziman. Îcar ji partiyên siyasî tê xwestin xwe komî hev bikin. Ji civakê re vekirî bin û di mijarên giştî de li gel hev bin. Di mijarên navxweyî de jî em dikarin wekî civaka xwe xwedî nerîn, bîrdozî, raman û alên cûda bin. Min got ev dewlemendiye. Niha dijminên me her dixwaze nîşan bide kurd ne yekin û parçe ne. Ev jî şerê taybet e û li dijî îradeya kurdan bikar tînin.



# Di cîhanê de mezinkirina zarokan li ser fikrên tundûtûjiyê

Di serdema modernîteyê de çima diyardeyên mezinkirin û neçareserkirina tundûtûjiyê li gel zarokan derdikevin holê, gelo dixwazin bi vê yekê civakê bi nifşên nû ji hev bixin?

**Navenda Nûçeyan**

Yekem mînaka tundûtûjiya mirovan a ku di dîrokê de li seranserê hemî netewe, çand û şaristaniyan de hatiye tomar kirin, vedigere destpêka hebûna mirovan li ser Erdê, dema ku Qabîl birayê xwe Habîl kuştiye. Ji ber vê yekê, yekem mînaka tundûtûjiya mirovan a tomarbûyî tundûtûjiya navmalî bû, û tundûtûjiya di navbera mirovan de hîn jî di bin lêkolîn de ye.

Di nava vê rapora xwe de me xwest em balê bikşînin li ser şêwayê avakirin, mezinkirin û rêxistinkirina zihniyeta tundûtûjiyê di nava zarokan de, çawa zarok rûbirûyê ku li ser zihniyeteke tund bêne mezinkirin û ev yek çawa bi demê re bandorê li ser kesayeta wan dike ku dihêle di encam de bibe xudiyê karektereke dund, hişk û metirsîdar. Dibe ku sedemên avakirina vê zihniyetê li gel zarok û ciwanan vedigere gelek bûyer û sedeman, ji ber wê yekê em ê vê xalê û gelek xalên din di hundir rapora xwe de bînin ser ziman û çawaniya çareserkirina vê diyardeyê di nava civakê de.

Di cîhanekê de ku divê ji bo zarokan cihê herî bi ewle be, lê belê hejmarên ku hatine tesbîtkirin rastiyek xemgîn eşkere dikin. Her sal bi sed mîlyonan zarok rastî cûrbecûr cûreyên tundûtûjiyê tên ku li ser tevger û pêşkeftina wan a psîkeolojîk bandoreke kûr dihêlin. Ev ne tenê bi rûbirûbûna tundûtûjiyê ve sînordar dimîne, lê di heman demê de digihêje avakirina zihniyeteke tundûtûj di zarokan de jî ku dibe paşê veguhere reftareke mayînde ku vê diyardeyê di civakê de ji nû ve hilberîne.

Raporên navneteweyî nîşan didin ku ji nîvê zêdetir zarokên cîhanê, nêzîkî milyarek, salane rastî hin cureyên tundûtûjiyê tên, çi li malê, çi li dibistanan, çi jî li kolanan. Ev belavbûna berfireh a tundûtûjiya li dijî zarokan ne tenê dike pirsgirêkek takekesî, lê di heman demê de dike pirsgirêkek gerdûnî ku mudaxeleyeke lezgîn hewce dike.

**Çawa hişmendiya tundûtûjiyê çêdibe?**

Pispor dibêjin ku zarok bi tundûtûjiyê nayê dinê, lê belê hêdî hêdî bi saya hawîrdora xwe vê tevgerê bi dest dixe. Di nav van faktoran de ya herî girîng fêrbûna bi çavdêrîkirinê ye ku zarok reftarên ku dibîne teqlîd dike, çi di nav malbatê de be çi jî bi rêya medyayê be.

Dêûbavtiya tundûtûj jî di xurtkirina vê şêwazê de roleke girîng dilîze, ji ber ku lêdana bi domdar, îhanetkirina zarokan rê li ber wê ramanê vedike ku zordarî rêbazek rewa ye ji bo çareserkirina nakokiyan. Hawîrdora civakî jî roleke sereke di avakirina vê zihniyetê di serê zarokan de, dilîze. Bi taybet li deverên ku ji xizanî an jî şerê çekdarî dikişînin ku tundûtûjî dibe beşek ji jiyana rojane. Deverên ku tê de her tim şer, pevçûn, bikaranîna çekan û piratîkên ku ji aliyê çeteyan li hember gel tên derketin, ev yek dibe sedema herî mezin a avakirina kesayeteke tund di zarokan de. Mînaka wê ya herî mezin jî Rojhilata Navîn e!.

**Perwerdehiya nerasterast li ser tundûtûjiyê**

Her çendî zarok di pir rewşan de perwerdehiya rasterast a tundûtûjiyê wernegirin jî, tiştek heye ku dikare wekî “perwerdehiya nerasterast” were binavkirin ku bi rêya normalîzekirina tevgerên tundûtûjiyê çêdibe, wekî rewakirina lêdan wekî rêbazek dîsîplînê, an teşwîqkirina zarok ji bo bersivdayîna bi tundûtûjiyê. Dema ku zarokek bi rêya tundûtûjiyê bêyî cezakirin tiştê ku dixwaze bi dest dixe, ew fêr dibe ku ev tevger bi bandor e. Ev rewş aloztir dibe dema ku alternatîfên perwerdehiyê yên ku şêwazên diyalogê û xwekontrolkirinê fêrî zarokan dikin nebin. Yek ji encamên herî tirsnak ên lêkolînan ew e ku zarokên ku rastî tundûtûjiyê tên, îhtîmala ku paşê wê bikin zêdetir e, û ev yek çerxek xerab diafirîne ku ji nifşekî bo nifşekî din tê veguhestin. Ev pêşketina tundûtûjiyê li gel zarokan di piratîkên wan yên di dibistan, civak, malbat û li hewîrdora wî de derdikeve pêş. Ji ber wê jî em gelek mînakên di asta gerdûnê de dibînin ku zarok bûne weke kesên mezin û li hawîrdora xwe atmosfereke tirsnak û tund dane avakirin.

**Sedemên tundûtûjiya li ser zarokan: Faktorên civakî û pîskolojîk**

Zextên civakî di tevgerên zarokan de roleke mezin dilîzin. Malbatên ku pirsgirêkên aborî an civakî dijîn, bandorek neyînî li ser zarokên wan dike. Ev zarok dikarin rastî zextên derveyî werin ku wan ber bi tundûtûjiyê ve û wekî rêyek ji bo îfadekirina hestên xwe an jî bidestxistina tiştê ku ew dixwazin ve dibe.

Tevlîheviyên derûnî dibe sedema ku bandora wan li ser reftarên zarokan bike. Ev hest dikarin wan ber bi nîşandina tevgerên êrîşkar ve bibin. Wekî din, nekarîna îfadekirina hestan bi awayekî rast dikare bibe sedema pêşketina nêzîkatiyên ne tendurist ku di terzên wan yê civakî de bandoreke xirab dike.

**Faktorên jîngehî û çandî**

Jîngeha derdorê faktorek girîng e di şekildana reftara zarokan de. Zarokên ku di jîngehên tundûtûj de mezin dibin an jî dibin şahidê pevçûnan pir caran, dikarin van tevgerên êrîşkar teqlîd bikin. Bi heman awayî, bandora hevalên wan ên ku tundûtûjiyê dikin dikare reftarên xirap xurt bike.

Rola çandî di pêşxistin an jî pêşîgirtina li tundûtûjiyê di nav zarokan de. Nirxên çandî dikarin roleke girîng di qebûlkirin an jî redkirina tundûtûjiyê de bilîzin. Di hin çandan de, reftarên êrîşkar dikarin wekî beşek qebûlkirî ya normên civakî werin hesibandin, lê di hin çandên din de efukirin û diyalog têne teşwîqkirin. Ev cûdahî bandorê li ser awayê ku zarok li ser mezin dibin dike.

**Bandora medyayê û tekneolojiyê**

Lêkolîn nîşan didin ku naveroka medyayê dikare asta şîdeta di nav zarokan de zêde bike. Bernameyên televîzyonê û lîstikên vîdyoyê yên ku dîmenên tundûtûjiyê dihewînin dikarin van reftaran normal bikin, û bibin sedem ku zarok bêtir tiştên ku dibînin teqlîd bikin.

Tekneolojiya nûjen dibe sedema guhertina şêwaz û reftara zarokan. Bikaranîna naveroka tundûtûjîyê li ser înternetê û medyaya civakî dibe ku meyla wan a ber bi tundûtûjîyê ve zêde bike, ji ber ku rûbirûbûna berdewam a bi naveroka wiha re dikare bandorek neyînî li ser derûnî û têkiliyên civakî yên zarokan bike.

**Nebûna perwerde û lênêrînê**

Dêûbavtiya erênî ango terbiyekirina erênê hêmanek sereke ye di şekildana tevgerên zarokan de. Ew dibe alîkar ku nirxên rêzgirtin û hevkariyê werin çandin, bi vî rengî îhtîmala tevgerên tundûtûjî kêm dibe. Bi perwerde û mînakên baş, dê û bav dikarin zarokên xwe ber bi reftarên rast ve bibin.

Di heman demê de nebûna lênêrîna malbatê di şekildana reftara zarokan de roleke girîng dilîze. Zarokên ku di jîngehên bê piştgirî û lênêrîn de mezin dibin, dibe ku xwe paşguhkirî hîs bikin ku ev yek dibe sedema tevgerên tund. Ji ber vê yekê, dabînkirina jîngehek malbatî ya saxlem û aram ji bo parastina li dijî tevgerên tundûtûj, girîng e.

**Zarokên di bin ala tundûtûjiyê de: DAIŞ’ê çawa nifşek ji şervanên biçûk avakir?**

Di yek ji diyardeyên herî xeternak de ku cîhan di van salên dawî de dîtiye, ew jî rêxistina Dewleta Îslamî tenê bi leşkerkirina mêran ve sînordar nebû, lê berê xwe da komeke hîn xeternaktir ew jî; zarok bûn. Ev kes ne tenê qurbanî bûn, lê di çarçoveya projeyek demdirêj de ji bo avakirina nifşek ku hilgirê ramanên tundrew, di makîneya tundûtûjiyê de bûn amûr.

DAIŞ ji bo mezinkirina zarokan rêbazên sîstematîk bikar dianî. Ji temenê biçûk ve bi îdeolojiya radîkal a teng dest pê dikir ku tê de şîroveyên hişk û çewt ên olê ku kuştin û tundûtûjiyê rewa dikirin, ji wan re dihatin pêşkêş kirin. Di dibistan û kampên taybet de, zarok ji her perwerdehiyek normal bêpar man, û bernameya xwendinê bi materyalên ku balê dikişînin ser şer û taeta kur, hate guhertin.

Mesele tenê di aliyê îdeolojîk de nesekinî, lê zarok rastî perwerdehiya leşkerî ya dijwar hatin di nav koma ku wekî “Eşbelên Xîlafetê” dihatin nasîn. Li wir, ew fêrî bikaranîna çekan bûn, perwerdehiya şer dîtin, û hin ji wan jî neçar man ku beşdarî darvekirinan bibin, da ku astengiya pîskeolojîk a li hember tundûtûjiyê bişkînin.

DAIŞ’ê her wiha bi armanca normalîzekirina tundûtûjiyê di hişê wan de, bi berdewamî zarokan bi dîmenên kuştin û îşkenceyê re rûbirû dikir, hem di jiyana ser rûyê erdê de û hem jî bi rêya vîdyoyên propagandayê. Her wiha ew ji cîhana derve hatin veqetandin, û ew neçar man ku di hawîrdorek girtî de bijîn ku tê de tenê îdeolojiya rêxistinê dizanin.

**Çareserî**

Çareserkirina pirsgirêka tundûtûjiya di nav zarokan de bi yek gavî nayê kirin, lê belê têgihîştina sedeman û xebatkirina li ser bêtirî yek astê hewce dike: di nav malbatê de, li dibistanê û di civakê de.

**Di nav malbatê de:**

Divê dê û bav bi aramî tevbigerin û bibin mînakên baş ji wan re, ji ber ku zarok tiştê ku dibînin teqlîd dikin.

Li şûna lêdanê an qîrînê diyalogê bi kar bînin, ji ber ku cezakirina tund pirsgirêkê zêde dike û çareser nake.

Hestekî ewlehî û xwe pê re mijûlkirinê bidin zarok, ji ber ku paşguhkirin dikare bibe sedema ku ew xwe bi tundî îfade bikin.

Fêr bikin ka zarok çawa hêrsa xwe bi devkî, ne bi lêdanê, îfade bike.

**Li dibistanê:**

Pêşxistina çandeke rêz û hevdu efukirinê di navbera xwendekaran de.

Hebûna şêwirmendên psîkolojîk ji bo şopandina tevgerên zarokan.

Bi lez û bez çareserkirina bûyerên dedequdiyê û bikenîna bi hev du.

**Li ser asta civakê:**

Kêmkirina naveroka tundûtûjiyê di medyayê de ku ji bo zarokan hatiye çêkirin.

Lidarxistina kampanyayên hişyarkirinê ji bo dêûbavan li ser dêûbavtiya erênî.

Pêşkêşkirina çalakiyên werzîşî û hunerî ku alîkariya zarokan dikin ku enerjiya xwe bi awayekî saxlem berdin.

Ezmûna zarokên DAIŞ’ê aliyekî tarî yê îstismara zarokatiyê di şeran de eşkere kir ku tê de dibin qurbanî amûrek tundûtûjiyê. Bi bidawîhatina kontrola DAIŞ’ê li gelek deveran, barê herî mezin li ser pişta civaka navnetewî ye ku van zarokan ji nû de ava bikin û bi wan re mijûl bibin. Û şansek rastîn bidin wan ku vegerin jiyanê. Her wiha gelek dayîkên malbatên DAIŞ’ê hene ku di hişê zarokên xwe de fikrên îslama radîkal a kur û teng didin avakirin. Divê civakên navnetewyî, rêxistinên jin û yên parastina mafê zarokan xwe li hember vê yekê berpirisyar bibînin û rewşa van zarokan were çareserkirin. Mînakên van malbatan jî ku di herêmên Bakur û Rohilatê Sûriyê de (Rojavayê Kurdistanê) de jinên DAIŞ’ê zarokên 5 salî li ser fikra şopandina Xîlafê, şopa bavê xwe ya DAIŞ’ê mezin dikirin.

Têbînî: Eger zarokek tevgerên tundûtûjî yên berdewam an giran nîşan bide, çêtir e ku mirov bi pîskologek re şêwir bike, ji ber ku tundûtûjî dikare nîşana pirsgirêkek kûrtir be wekî fikar an jî ji tiştekî derbe xweribe.

Bi kurtasî, çareserî ne di cezakirinê de ye, lê di têgihîştin, rênîşandan û avakirina hawîrdorek ewle de ye.

Weke tekezî li ser xeteriya vê diyardeyê me ev mînaka ku di Bakurê Kurdsitanê de pêk hat anî ziman: Di van hefteya dawiyê de li Mereşê ya Bakurê Kurdistanê li hember dibistaneke navîn êrîşa çekdarî pêkhat. Hat ragihandin ku êrîş ji hêla xwendekarê pola 8’an Î.A.M. ve hat kirin. Her wiha hejmara kesên jiyana xwe ji dest dane 9 kes bûn. Di dema êrîşê de 13 kes, 6 jê bigiranî birîndar bûn. Herwiha careke din êriş ji aliyê xwendekaran ve li Lîseya Anadoluyê ya Pîşeyî û Teknîkî ya Ahmet Koyuncu ya navçeya Sêwereg a Rihayê, pêkhat ku di encamê de 16 kes birîndar bibûn.



**Bîra Civakê**

**Ehmed Hesen**

## Edaleta ku bibe jehra civakan qirkirin bi xwe ye

Di nava sîstemên faşîst û ne Demokratîk de edaleta ku behsa parastina mafên civak û mirovan dikin gelek in û her edaletek li gorî rêûresma ku ew sîstem xwe sîstematîze dike zagonên xwe datîne, di rastiya têgîna edaletê de ya rastî azadî tê pênasekirin û dîtin, edaleta civakî xwedî xisletên parastina exlaq û nirxên civakî yên resen e, di heman demê de çi biryar û bendên ku di nava xwe de digire diviya destpêkê parastina nirxên civakî û pirçandiya wê civakê di ber çavan re derbas bike, ango dijbertiya çand, tûre, ziman û rastiya civakî nake, di heman demê divê bibe sîpereke rasteqîn a parastina van pîvanan. Ya rastî di roja îroyîn de rêjeya makezagonên sîstemên di rojhilata navîn de hene gelek li pêş in, lê bi qasî wê rêjeyê jî mafên civakan nayên parastin, berovajî wê dizî, kuştin, çetetî, cudabûna etnîkî, Olî û mezhebî her ku diçe kûrtir dibin, ji ber van sedeman belkû bi hezaran jin, zarok û ciwan rastî bêedaletiya di derheqê civakê û prensîpên wê de hatine û ji mafên xwe yên jiyanî mehrûm hatine hiştin, nexasim li Îranê tevahiya sîstema dadwerî ya welat “ji Dadgeha Bilind bigire heta dadgehên herêmî” hemû jî di bin rêveberiya Wezareta Dadê ya Îranê de ye, ji bilî Wezîrê Dadê û Serokê Dadgeha Bilind ku ew jî ne xwediyên dayîna biryara destûrên bilind in, bi vî rengî tiştek bi navê edaleta civakî li holê nehatiye hiştin, a rast edaleta heyî edaleta parastina serweriya sîstema Îranê ye, ne ya gelê Îranê ye. Di heman demê de ji bo kurdan jî edaleta heyî heta mafên wan ên hêsan weke axaftina bi zimanê kurdî û nivîsandina wê li ser hinek malperan qedexe dike û cînayeta wê bi cezaya darvekirinê dibire, ev di bingeha xwe de ji naveroka edaletê wêdetir e, nabe exlaq jî, lê belê dibe nîjadperestî û perçiqandina mafên bingehîn ên civakê ye. Dîsa li Sûriye bi sedan kujerên ku li ser destên wan gelê Elewî û Durzî hatine qetilkirin, dûrî cezaya edaletê hatine ragirtin. Dîsa di Turkiye de sûcdarên komkujiyên li Roboskî, Efrîn û Serê Kaniyê pêk anîne serbest in, ev hemû kiryarên ku edaleta dewletê lê napirse, encama kiryara wê dewletê ne û bi borîna salan re li ser wan dozan tê nixumandin û jibîrkirin. Di heman demê de edaleta heyî di şeran komkujiyan rewa dikin, koçberiya bi darê zorê normal dibînin, bikaranîna çekên ku qaşo qedexekirî ne paşguh dikin û jiyana civakî bi zagonên tacîzî dadigirin. Lewma jî civak her ku diçin dibin koleyên van zagonan û di bin navê edaleta civakî de bê maf û edalet dimînin. Ji bo edaleteke rasteqîn, mirov xwe bispêre pirensîpên civaka xwezayî ya ku di nava xwe edaleteke xwebûnî û dûrî navendîtiyê dihewand, dê dihatir bikaribe rastiyan ji hev derxîne.